# Welatê Me

ROJNAMEYA HEFTEYÎ — SAL: 1 HEJMAR: 22 — 16 AVRÊL 1995 — BUHA:40.000 TL(KDVD)


Roja 12'ê avrêla 1995'an ji bo gelên Kurdistanê bû destpêkeke nû. Kesên ku beşdarî vebûna parlementoyê bûn dilşahiya xwe bi van gotinan anîn ziman:

# 'PARLEMENTO PÎROZ BE'


● Parlemana Kurdistanê ya li Derveyî Welat, di 12'ê avrêlê de li bajarê Holandayê, Laheyê li hola (salona) Nederlands Congres Gebouwê vebû.

● Di dema vebûna parlemanê de ji mebûs û rayedarên dewletan gelek kes bi mêvantî beşdar bûn. Parlemana Kurdistanê, bi rawestîna rêzgirtinê dest pê kir û ji aliyê 70 mensûbên çapemeniyê ve hate taqîbkirin.

● Di roja duyemîn a vebûna parlementoyê de Yaşar Kaya mîna Serokê Parlementoyê hate hilbijartin. Di hilbijartina Yaşar Kaya de, 62 dengên erênî derketin. Di rojên pêş de wê serokwezîr û berpirsiyarên din jî bên hilbijartin.

Rûpel 2





Li gorî anketa Komeleya Mafên Mirovan ya li ser kurdên koçbûyî:

## Kurd dixwazin vegerin welatê xwe

● Komîsyona Mafên Kurdan ya KMM'ê di rêbendana 1995'an de encama anketa xwe weşand. Komîsyana Mafên Kurdan, li ser malbatên kurd ên ku koçî Stenbol, Mersîn û Bursayê bûne, lêpirsînek çêkiriye. Kesên koçbûyî, %71.6'ê wan ji gundan in û ji ber siyaseta valakirina gundan a dewleta tirk dev ji gundên xwe berdane. %58 sebeba koçê bi hebûna şer ve %15 bi nebûna ewletiyê û %8.7 jî bi sebebên din ve girêdane.

Rûpel 8–9

## 16 hezar yewnanî ji bo Kurdistanê sitirîn

● Li Yewnanîstanê roja 8'ê avrêlê li stadyuma Aştî û Dostaniyê ji bo kurd û Kurdistanê bi beşdariya 26 hezar yewnanî monsereke muezem hate li dar xistin. Di konserê de gelek muzîsyen, parlementer û şexsiyetên din ên girîng hebûn. Konser ji aliyê Belediyeyan, Komeleya ENOSÎ û şaxên cîwanan ên çar partiyên siyasî ve hate organîzekirin.

Rûpel 7

## Ehmedê Xanî li Stenbolê bû

Bi pêşengiya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji ber sala Ehmedê Xanî roja 9'ê avrêlê bi navê "Konferansa Ehmedê Xanî" li Navenda Çandê ya Tarık Zafer Tunaya konferansek li dar ket. Zimanzan Feqe Hüseyn Sağnıç, Alîkarê Serokê Enstîtuya Kurdî Felat Dilgeş û Nivîskar Faik Bulut beşdarî konferansê bûn.

Rûpel 16

## Li seranserê Kurdistanê şer e

Şerê di navbera hêzên ARGK'ê û hêzên artêşa tirk de li seranserê Kurdistanê bi dijwarî didome. Ev hefte gerîlayên ARGK'ê li gelek deverên bakur û başûrê Kurdistanê livbaziyên dijwar pêk anîn. Li gorî daxuyaniya ARGK'ê, di 15 rojî de 896 leşker, kontra–ajan, cerdevan û 113 gerîla mirine û 102 leşker, kotra–ajan, cerdevan û 26 gerîla jî birîndar bûne.

Rûpel 10

## Navekî din ê têkçûnê: Vekişîn

Hêzên artêşa tirk, di 9'ê avrêlê de dest bi vekişîna ji başûrê Kurdistanê kirin. Li gorî agahiyan, hêzeke tirk ku ji 3 hezar leşkerî pêk hatibû, gihîşt Silopiyê. Li gorî agahiyên ku rayedarên artêşa tirk dane, wê artêş li gorî teqwîmekê, di nav 15 û 30 rojî de ji Başûr vekişe.

Rûpel 7

## 'Polîsan nîşan girtine û kuştine'

Rapora otopsiyê ya li ser 18 kesên ku di bûyerên Taxa Gaziyê de hatibûn kuştin, hate beyan kirin. Li gorî vê raporê 12 kes jê bi tenê bi guleyekê hatine kuştin. Gule jî li cihên wan ên mirinê ketine.

Rûpel 4

**JI ROJEVÊ**

# ROJEKE DÎROKÎ

**Qerara avakirina Parlamentoya Kurdistanê ya li Derve roja 12'ê rêbendana 1995'an li Bruksel, paytexta Belçîkayê hatibû îlankirin. Îlankirina qerareke wiha di dîroka kurd û Kurdistanê de dibû gavavêtina ber bi gaveke heyatî. Roja 12'ê avrêlê, yanî piştî sê mehên din ev qerar bi avabûna parlamentoyê hate cih.**

**Di pêvajoya sê mehan de li hemû welatên Ewrûpa û li Kanada û Avûstralyayê nûnerên gel ku wê di parlamentoyê de cih bigirin, hatin hilbijartin. Wekî din ji bo meşrûbûna vê parlamentoyê, karkeriya wê bi gelek nûnerên saziyên navneteweyî re têkilî danîn û karên dîplomatîk pêk anîn. Dawî 65 beşdariya hilbijêrên kurd ên li derve dijîn, 65 nûnerên parlamentoya li derve hatin hilbijartin.**

**Van 65 parlamenterên parlamentoya li derve roja 12'ê avrêlê bi vebûna parlamentoyê re yeko yeko derketin ser kursiyê neteweyî û sond xwarin ku wê li gorî berjewendiyên gelê Kurdistanê xebatên xwe bidomînin.**

**Avabûna parlamentoyekê ji bo gelekî ji 40 milyonan pêkhatî mafekî xwezahî ye. Parlamentoya Kurdistanê ya li derveyî welêt li gelê kurd xweş pîroz be.**


Remzî Kartal


Yaşar Kaya


Î. Şerîf Wanlî


Abdurrahman Durre


Zubeyîr Aydar

Roja 12'ê avrêla 1995'an ji bo kurdan bû destpêkeke nû. Kesên ku beşdarî vebûna parlementoyê bûn dilşahiya xwe bi van gotinan anîn ziman:

# 'PARLEMENTOYA LI DERVE LI GELÊ KURD PÎROZ BE'

Parlemana Kurdistanê ya li Derveyî Welêt, di 12'ê avrêlê de li bajarê Holandayê, Laheyê li hola (salona) Nederlands Congres Gebouwê vebû.

Di dema vebûna parlemanê de ji mebûs û rayedarên dewletan gelek kes bi mêvantî beşdar bûn. Parlemana Kurdistanê, bi rawestîna rêzgirtinê dest pê kir û ji aliyê 70 mensûbên çapemeniyê ve hate taqîbkirin.

Dîwana parlemanê ji sê kesan (du kesên herî ciwan û yekî bitemen) pêk hat: Î. Şerîf Wanlî, wekî endamê herî bitemen(70 salî) serokatiya dîwanê kir û parleman bi kurdî vekir. Wanlî, li ser prensîb, awayê xebat û lebata parlemanê bend bi bend îzahat da. Axaftina Wanlî, pir caran bi çepikan hat birîn.

Li hola kongreyê ala Tirkiyeyê ji nava alên dewletên dinyayê hate daxistin û li şûna wê ala ERNK'ê hate daleqandin. Ev kirin ji aliyê Kurdistaniyan ve bû sebeba kêf û çepikan. Ji bo vebûna parlemanê, çelenga ku serokê PKK'ê Abdullah Öcalan şandibû pir bal kişand ser xwe. ERNK, TAJK, Berpirsiyarê ERNK'ê yê ku li Îngilîstanê girtî ye Kanî Yılmaz, YRWK, HÎK, YAK, Yekîtiya Ezîdiyên Kurdistanê, Yekîtiya Asûriyan, Akademiya Kurdî jî di nav de, gelek kes û saziyan çeleng şandin.

Piştî axaftina vebûnê, mebûsan li gorî alfebetîka paşnavên xwe, sond xwarin. Sond, bi zazakî, kurmancî, soranî û asûrî hate xwendin. sonda pêşîn ji aliyê Memo Açar ve bi Kirdkî (zazakî) hate xwarin. Di merasîma sondxwarinê de Serokê Yekîtiya Alewiyan Ali Haydar Celasun û Serokê Hereketa Îslamî Abdurrahman Durre, bal kişandin ser xwe. Sondxwarin, bi sonda Kemal Yücel qediya.

Li hola ku vebûna parlemanê tê de pêk hat, li paş dîwanê li ser qumaşekî zer ev nivîs hatibû nivîsandin: "Parlemana Kurdistanê ya li Derveyî Welat, 12 avrêl 1995" her derê holê bi rengên neteweyî hatibûn xemilandin. Di nava mebûsan de hinek endam bi timtêlên neteweyî derketin ser kursiyê, sond xwarinê.

**Mesajên pîrozbahiyê**

Ji bo vebûna parlemanê ji gelek sazî û partiyan mesajên pîrozbahiyê hatin. Mesaj, ji Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, Konseya Leşkerî ya ARGK'ê, Qerargeha Navendî ya Botanê, Qumandariya Qerargeha Behdînanê, Qerargeha Eyaleta Amedê, Dêrsimê, Xerzanê, Serhedê, Tolhildanê, GAP'ê û Mêrdînê, dîlên PKK'yî yên ku di girtîgehên KT'ê de ne, Serokê HADEP'ê Murat Bozlak, Serokê DEP'ê Hatip Dicle û hwd. hatin parlemanê.

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di mesaja xwe de li ser wesfên Parlemantoyê disekine û dibêje ku Parlemanto ne ya partiyekê ye.

Öcalan dide zanîn ku ji demeke direj ve ye xebitîne ku bingeha îradeya gel a herî mezin deynin û ev parlementoya li derve ji bo parlementoya neteweyî gaveke dîrokî ye. Ji aliyê din ve diyar dike ku bi hemû hêza xwe ve li pişta vê parlementoyê ne û heta dawiyê wê destek dikin.

**Tewra PKK'ê**

Serokê Giştî yê PKK'ê di mesaja xwe de bi dewamî wiha dibêje: "Em vê yekê jî zelal bikin, ev rewş nayê wê maneyê ku Parlemento ya PKK'ê ye. Jixwe ne tiştekî dirust e ku Parlemantoyek a partiyekê be. Ne hewce ye ku wisa be jî. Ji partiyê bûn û Parlemantoyê bûn tiştên ji hev cihê ne. Divê mirov bi propagandeyên dijmin nexape. Bi taybetî jî divê dostên me destûr nedin xebatên ku dixwazin Parlementoyê bikin rêxistineke PKK'ê. PKK hebe jî nebe jî ihtiyacî bi Parlementoyeke wiha heye."

Li ser rengê kesên ku di parlementoyê de cihên xwe standine jî disekine û wiha dibêje: "Em bawer dikin ku di civîneke din de wê mirovên ji ramanên cihê û rêxistinên din jî bikevine nava vê parlementoyê."

Nûnerê ERNK'ê Ali Xerzan jî mesaj şande vebûna Parlementoya Kurdistanê. Xerzan daxuyand ku ev rewş, qonaxa bi iktîdarbûna gel a neteweyî ye û bawer dikin ku wê Parlemento

## Endamên Parlementoyê

| | | |
|---|---|---|
| 01– Alî Aliyev | 23– Durre Abdurrahman | 45– Katalay Petros |
| 02– Açar Mamo | 24– Dara Dilbixwîn | 46– Matur Alî |
| 03– Alatas Elif | 25– Devran Mehmet | 47– Melahat |
| 04– Aryo George | 26– Dutar Hasan | 48– Muhammed |
| 05– Aktaş Ahmet | 27– Demirkapı Rodî | 49– Merabî Samoev |
| 06– Ateş Helîn | 28– Dündar Sait | 50– Özkan Celal |
| 07– Akbaba Alî | 29– Göksungur İsmaîl | 51– Özgün Yilmaz |
| 08– Akar Sînan | 30– Gül Aydın | 52– Öztürk Maşallah |
| 09– Asuryan Şeref | 31– Gül Kazım | 53– Özden Zeynep |
| 10– Alkan Xanê | 32– Hasso Derwêş | 54– Pencewînî Mehmet Emîn |
| 11– Aydar Zubeyir | 33– Kuru Alî Ekber | 55– Rohat Mustafa |
| 12– Aydin Huseyîn | 34– Koçgirili Cafer | 56– Saçik Alî |
| 13– Başboğa Felemez | 35– Kurt Dilek | 57– Salîh Karvan |
| 14– Bedîroğlu Boroyev Rustem | 36– Kiliç Hasan | 58– Sapan Alî |
| 15– Bawermend Azîz | 37– Kadir Jebar | 59– Tas Güler |
| 16– Buldan Necdet | 38– Kalfirat Latîf | 60– Taşkale Mehmet |
| 17– Bucak Serhat | 39– Kilinç Mahmut | 61– Tîmurleng Kazim |
| 18– Burukî Şemdîn | 40– Kerîmoviç Nadîr Nadîrov | 62– Toğuç Nîzamettîn |
| 19– Celasûn Alî Haydar | 41– Kartal Remzî | 63– Wanlî İsmet Şerîf |
| 20– Caferoğlu Kelasov Mîkaîl | 42– Kara Şemsettîn | 64– Yîğit Alî |
| 21– Charkseher Hasan | 43– Kaya Şerefettîn | 65– Yücel Kemal |
| 22– Caklo Musa | 44– Kaya Yaşar | |

**Jêrenot: Parlamento ji 75 endaman pêk tê, cihê 10 endaman niha vala ye.**

www.arsivakurdi.org

## JÛTÎ

Doğan Güzel




### SONDA DESTÛRÎ YA PARLAMENTOYA KURDISTANÊ YA LI DERVEYÎ WELÊT

**(Kurmancî)**

Di bin her mercê de, bingeh girtina îradeya gelê xwe, xebatkirin ji bo azadiya Kurdistanê, di navbera gelê Kurdistanê de bê cudabûn mafê wan bi layiqî nûnerkirin û parastina mafê wan, ji bo gelê Kurdistanê armanckirina civakeke demokrat, wekhev û azad, di xebatên xwe de tu mafên şexsî nadim ber çav û ji bo parastina wekhevî û yekîtiya neteweyî, heta dawî girêdanmayîn bi şehîdên Kurdistanê re û bi nirxên neteweyî ve, di hizûra dîrok û mirovatiyê de, li ser gelê xwe, welatê xwe, namûsa xwe û li ser şerefa xwe sond dixwim.

### SONDWERDISA PARLEMENTOYA KURDISTAN A NAFÎ

**(Dimilî)**

Ez hemberî dîrok û mirovtî de ser gelê xo û welatê xo, namus û şerefê xo sond wena ku, her rewşîde bi hîmguretena îrada gelê xo, seveтanê azadiya Kurdistan karkeran, bê firq wertêkerdena gelê Kurdistan temsilkerdena bercewendiya dina kena û menfatê dinê parêzena, sevetanê gelê Kurdistan rewşa demokrasî, zejubînî û raya civakî xorê hedef cêna, karê xo de menfatê xo nêparêzena û jubûna gelê wazena, xo bi şehîdanê Kurdistan û bihayên netewî girêday vênena.

### PARLEMANÎ KURDISTAN LE DEREWE SIWÊNDÎ DESTÛRÎ

**(Soranî)**

Bo le ber çawgirtinî wîstî gelekem le hemû rewşêk da û le têkoşan im da bo azadî Kurdistan, be mebestî be yek çaw temaşakirdinî gelî Kurdistan le miyaney niwênerayetîm da û bo parastinyan, herweha bo kirdine amancî bedîhênanî komelêkî dîmokrat, wekhev û azad bo gelî Kurdistan, bo çawpoşî le hemû berjewendiyekî take kesî, bo bergirî kirdin le yeksanî û yekêtî neteweyî, bo be peywestdar manewem be şehîdanî Kurdistan û beha neteweyekanewe, le berdem dîrok û mirovayetî da, be gel im, welat im, xakî Kurdistan, xwênî şehîdan, abrû û şeref im siwênd dexom.

bersivê bide daxwazên xelasiyê ya gelê Kurdistanê.

**Parlementoyeke rengîn**

Di Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welat de ji gelek komên mezhebî, etnikî, meslekî cih distînin. Ji aliyê din ve heman heman hemû kurdên ku li dinyayê belav bûne tê de têne temsîlkirin. Ji DYA (USA) heta bi Awistralyaye, ji Rûsyayê heta bi Sulêmaniyê kurd, hem tê de tên temsîlkirin û hem jî hatibûn vebûna Parlementoyê.

Piştî vebûnê; saet li dora 13.00'an civîna çapemeniyê hate lidarxistin. Di dîwanê de Î.Şerîf Wanli, Yaşar Kaya, Remzî Kartal û Alî Sapan cih girtin. Serê peşîn Ali Sapan dest bi gotinê kir û gote ku "Em li ser navê gelê xwe di şadiyeke mezin de dijîn. Em kurd, di dirokê de cara pêşîn e ku keyseke wiha bi dest dixin." Sapan di axaftina xwe de da zanîn ku di dunyayê de gelên ku nifusa wan 95 hezar e xwedî Parlementoyê ne lê kurd bi nifûsa xwe ya 25 milyonî ne xwediyê palmentoyê bin, tiştekî ecêb e.

Sapan diyar kir ku ji 13'ê avrêlê bi şûn ve wê lihevrûniştinan pêk bînin û wê çar rojan bidome. Di van lihevrûniştinan de wê Serokê parlementoyê, Lijneya Rêvebirine û serokê wê hilbijêrin, qanûnên avakirina parlementoyê munaqeşê bikin û bidine pejirandin. Ji aliyê din ve ji dan zanîn ku wê komisyonên xebatê jî pêk bînin.

**12 milyon kurd li Ewrûpayê ne**

Ali Sapan der heqê van yekan de jî gote ku wê di 18'ê avrêlê de bi civîneke çapemeniyê encaman ji rayagiştî re daxuyînin. Li ser pirsa rojnamegerekî ku got: "Parlementoya we serbixwebûnê an ji otonomiyê dixwaze?" Alî Sapan ev bersiv da: "Tu mafên kurdan nîn in. Ji ber vê yekê em dixwazin mafên kurdan ên neteweyî û demokratîk bêne dayîn." Der barê şerrawestîna bidualî de jî wiha got: "Têne di rewşeke wiha de mirov dikare li ser pêşniyazên çareseriyê munaqeşeyan li dar bixe. Em ji aligirên çareyeke neteweyî–demokratik in. Wê Parlementoya kurdan hebe, piştî re dikare federasyoneke her du gelan bê bipêşvebirin. Heke bersiveke bişîdet ji têkoşîna kurdan a meşrû û demokratîk re, qedexetî li ser hemû mafên kurdan bê danîn, ji şer pê ve bersivek namîne."

Li ser pirsa ku li Hewlêrê jî parlementoyeke kurdan heye, gote ku 12 milyon kurd ji ber pêkutiyên Tirkiyeyê yên mîlîtarîst hatine Ewrûpayê û di Parlementoya li Derveyî Welêt de kurdên ji Başûr, Başûrê Biçûk û Rûsyayê hene.

**Parlementoya hemû kurd û kurdistaniyan**

Sapan beyan kir ku dewletên Rojava tevî Tirkiyeyê ji bo ku Parlementoya Hewlêrê peywira xwe neyine cih, tekilî wê bûne û ew parlemento, parlementoyeke herêmî (mahalî) ye. Tenê deng li parçeyekî welêt dike. Ji aliyê din ve daxuyand ku wê pê re jî peywendî deynin.

Remzî Kartal li ser pirsa ku çima rêxistinên din jî beşdarî parlementoyê nebûne ev bersiv da: "Parlemento her kesî hembêz dike. Hemû sazî û şexsiyetên siyasî dikarin bikevine jixwe ev yek di qanûnên parlementoyê de hene."

Der heqê bûyerên li Almanyayê jî Alî Sapan gote ku gelê kurd cengeke rewa (meşru) dide û PKK serî li Peymana Cenewreyê daye ji bo ku mîna aliyekî cengê bê pejirandin. Sapan axaftina xwe bi van daxuyaniyan qedand: "Heke hûn bibêjin: 'Kurd şerên xwe tînin Almanyayê jî,' hûn tiştekî rast nabêjin. Ji ber ku Almanya bi Tirkiyeyê re hevpariya sûc dike, lewma şerê li Tirkiyeyê biqede wê yê li Almanyayê jî biqede."

Di dawiya Civînê de Ozanên Hunerkomê, Nasir Rezazî û hunermedê Asûrî Tames Gabriel konser dan beşdaran.

**Welatê Me/Kurd–A**

## KURTENÛÇE...KURT



## MÎT li cenazeyên wezîfedarên Kızılayê bû

Rojnameya Hürriyetê îtiraf kir ku endamên "Kızılayê" yên ku li Başûr hatine kuştin edamên MÎT'ê ne. Hürriyet di nûçeya li ser cenezeyê her sê kuştiyan wiha dibêje "Di merasimê de ji wezîfedarên Kizilayê bêhtir endamên MÎT'ê hebûn. Di nav endaman de musteşarê MÎT'ê Sönmez Köksal jî bal dikişand wekî din cenaze li goristana leşkerî ya Cebeciyê hatin temartin.

Heta niha kesî nedîtiye ku ew çend endamên MÎT'ê beşdarî cenazyên sê wezîfedarên ji rêzê yên saziyeke sivîl bûne. Ji xwe piştî kuştina wan her sê wezîfedarên Kizilayê ajansa KurdA yê ji devê gerilayê ARGK'ê bi diyar kiribû ku ev hersê kes endamên MÎT'ê ne.

Heftiya çûyî me li ser têkiliyên MÎT û Kızılayê nivîsandibû.Lewre wêneyê di Hürriyetê de hatiye weşandin, çawa ku Ji bo wê nûçeyê hatibe kişandin, hevûdin temam dikin.

**Navenda Nûçeyan**

## Serokê Komîsyona HADEP'a Edenê kuştin

Roja 12'ê avrêlê, li Edeneyê, li taxa 19 Mayis'ê, Serokê Komisyona Taxê Rüstem Akan (45) ji hêla kontrayan ve hate kuştin. Te gotin ku, beriya kuştina Rüstem Akan bi 10 deqîqeyan hêzên dewletê li cihê bûyerê bûn. Piştî kuştinê hêzên dewletê wekî her car mirovên derdora cihê bûyerê girtin.

Rüstem Akan, roja 13'ê avrêlê bi beşdariya 1500 kesî ve bi sloganên mîna "Şehîd namirin", Kurdistan wê ji faşîzm re bibe goristan", "Kontra bimrin" û "Bijî Parlementoya li Derveyî Welêt" hate veşartin.

Beriya veşartina cendekê Rüstem Akan, serokê HADEP'a Edeneyê Samet Yaman ji bo bîranîna şehîdên Kurdistanê xwest ku deqîqeyeke gel li ser-piyên xwe raweste. Piştre ji Cîgirê Sekreterê Giştî ya HADEP'ê Şehmus Çağro axaftineke bi kurdî kir. Çağro wiha peyivî: "Piştî şehîdkirina hevalê Rüstem şehîdên me yê HADEP'a Edeneyê derketin 4'a. Li welatê me îro têkoşîneke xurt û birûmet heye, di vê tekoşînê de bi hezaran, bi milyonan şehîdên me jî çêbin em dev ji vê tekoşînê bernadin."

**Welatê Me/ Edene**

Navên **10** kesên ku di xaçepirsa hejmara 20'an de peyva veşarî **'Bajarvanî'** dîtine û pirtûka **"Keskesor"** qezenc kirine:

Haki Kapazan
Stenbol

**Aziz Yıldız**
**Turgutlu/Manisa**

Arif Oktay
Tarsus/Mersin

**Fırat Agir**
**Ruha**

Tüm–Sağ–Sen
Amed

**M. Doğan**
**Mersin**

Sinan Sütpak
Semsûr

**Baran Berk Selçuk**
**İskenderun**

Vahap Karvar
Meletê

**Ayşe Kardelen**
**Çinar/Amed**

## Li ser qetlîama taxa Gaziyê, dewletê îtîraf kir:

# 'Polîsan nîşan girtine û kuştine'

Rapora otopsiyê ya li ser 18 kesên ku di bûyerên Taxa Gaziyê de hatibûn kuştin, hate beyan kirin. Li gorî vê raporê 12 kes jê bi tenê bi guleyekê hatine kuştin. Gule jî li cihê wan ên mirinê ketiye.

Saziya Adli Tipê rapora xwe ya otopsiyê daxuyand. Di raporê de dide zanîn ku sebeba mirina 15 kesan derba gule û berikan e. 12 kes jî bi guleyekî tenê hatine kuştin. Di cesedekî de rastî heft birînên guleyan hatine û di çar terman de jî dendikên guleyan bi dest xistine.

Raporên otopsiyê dide xuyan ku polîsan bi zanetî gulê berî mirovan dane. Hem jî ji menzîlên dûr nîşan li wan hatiye girtin, ji bîlî çar kesan gule bedena wan qul kiriye û derbas bûye. Çapa gule jî 9 mm bûye. Li gorî encama rapora otopsiyê, polîs di dema belav kirina gelê ku xwestiye bûyera gulebarankirina qehwexaneyan protesto bike de bi zanebûn mirov ji silehên xwe re kirine hedef û derba mirine daweşandine wan.

Tê zanîn ku li Taxa Gaziyê ya Gazi Osmanpaşayê re 12'ê adarê qehwexane hatibûn gulebaran kirin, li ser vê yekê gel ev bûyer protesto kiribû. Mudexaleya polîsan, kiribû ku tenê li taxa Gaziyê 18 kes bi silehan bên kuştin.

**Navenda Nûçeyan**



## Girtîgeh dîsa dikelin


Li ser girtîyên siyasî pêkûtî û cerda rayedarên girtîgehan û cendermeyan nasekine. Li hemberî van êrîş û pêkûtiyên li Girtîgeha Yozgatê greva birçîbûnê kete roja 27'an. Girtiyan daxuyandin ku rayeder mafên wan qebûl nekin wê greva birçîbûnê vegerînin "Rojiya mirinê". Malbatên girtiyan gotin ku: "Li girtîgehê gardiyaneke bi navê Recep İlhan û pênc hevalên wî êrîşî girtiyan dikin. İlhan û hevalên wî sempatîzanê MHP'ê ne û li xwe navê "Takıma A" danîne. Gava em diçin hevdîtina zarokên xwe, faşîstên Yozgatê û polîsên sivîl me tehdît dikin. Xwarin û kincên ku em dibin girtîgehê, gardiyan li ser navê lêgerînê dirijînin û diçirînin. Emê jî dest bi greva birçîbûnê ya bêmudet bikin..

Malbatan rayedarên Weziriya Karê Dadê jî sûcdar kirin û gotin ku: "Rayedarên weziriyê van hovîtiyan dibînin û bêdeng dibînin. Em wezîriyê û hikûmetê, ji tiştên biqewimin mesûl digirin. Li girtîgehên ku girtiyên siyasî tê de dimînin, wekî Erzerom, Konya, Kayserî, Bayrampaşa û hwd. jî cerd û pêkûtiya gardiyan û cendermeyan li ser girtiyan her diçe dijwartir dibe. Girtî, ji rayagiştî li hemberî van hovîtiyan piştgiriyê dixwazin.

**Navenda Nûçeyan.**

### XAÇEPIRSA BIXELAT (20)

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| ■ | G | ■ | T | ■ | R | ■ | A | ■ | Û | ■ |
| H | U | D | A | S | E | B | R | Î | ■ | A |
| ■ | L | O | R | Î | ■ | R | E | C | E | B |
| V | A | J | Î | ■ | S | Û | ■ | A | L | O |
| ■ | N | E | ■ | E | F | S | I | R | Î | N |
| H | ■ | H | E | N | E | K | ■ | E | F | E |
| ■ | W | ■ | R | Î | N | ■ | Î | | | |
| P | A | L | E | ■ | K | O | N | | | |
| ■ | T | ■ | B | O | S | N | A | | | |
| T | E | R | E | S | ■ | C | D | | | |



PEYVA VEŞARÎ: B A J A R V A N Î

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi usûla qurayê li deh kesan tên belavkirin. Xelata hejmara 22'an; pirtûka **Çexov "Bexçeyê Vîşne"** ye. Ev pirtûk ji aliyê weşanxaneya **NÛDEM'ê** ve hatiye çapkirin.

**Jêrenot:**
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

**Xelata Xaçepirsê**




"Bexçeyê Vîşne"
**Çexov**

### XAÇEPIRSA BIXELAT (22)

Kesê di wêne de / Ask — Welatek / Erd — Gihanekek / Notayek — Feqîrî — Pîrek / Mindal — Zarîf — Puteke heywanan / Nam — Pê li ser berfê dikin / Şîrove — Xwende, jîr / Dayîk — Navê mehekê / Di muzîkê de bêhndan — Ben — Nêrevan / Notayek — Kesê keleweca wî/wê heye — Cejn — Kar — Bawerî / Navek — Germ — Sembola oksîjenê — Kategoriye ke kulturî — Kurtanê hesp — USA / Ray — Cînavkek / Beyreq — Aleteke tûj — Sikûnet — Navekî meha rezberê



PEYVA VEŞARÎ: 1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11

# Li Fransayê pêla grevan

Berî hilbijartina ji bo serokkomar ya 23'yê avrêlê karkerên fransiz li gelek deran dest bi grevê kirin û meş û livbazî pêk anîn. Tê gotin ku heta hilbijartinê wê karkerên gelek karistanan ji bo îmkanên kar û meaşeke baş, kar berdin û livbaziyên cur bi cur pêk bînin.

Rojê 10'ê avêlê li bajarê Toulonê xebatkaran Postexaneya La Valetteyê ev der îşgal kirin. Xebatkaran bi daxwaza zêdebûna derfeta kar ev bû 5 hefte ku dest bi grevê kirine. Ji wê rojê heta îro du caran ku îşgal pêk hat û heta niha 6 erebeyên poste jî hatine şewitandin. Ev grev heta bajarê Marsîlyayê belav bû.

Li aliyê din pîlot û makînîstên şîrketa rêhewayê Air Inter'ê yekbûna vê şîrketê û Air France protesto kirin û roja 9'ê mehê derketin grevê. Heke ev her du şîrket bibin yek wê 600 xebatkar ji karê xwe bibin. Li bajarê Poitiers'a ku li rojavayê Fransayê ye, 700 karkarên karistana tekerên traktoran di 7'ê mehê de ji bo meaşeke baştir dest bi grevê kirin, çavdêrên grevê nahêlin ku mal derkeve derve.

Li gelek şîrketên wekî Renault, Kodak, Ricoh û Rhone Poulenc jî grev heye. Sendîkayên karkerên ragihandinê roja 13'ê mehê ji bo 24 seatan kar berdan. Eynî rojê tevî xebatkarên bankayên Credit Lyonnais, Banqui Nationale de Paris û Societe Generale û komeleyên bêkaran li Parisê meş û xwepêşdan li dar xistin.

Li Fransayê grev heta Wezîriya Çandê ya Hikûmeta muhafazekar belav bûye. Xebatkarên Wezîriyê Çandê û Arşîvê Neteweyî grev ji 3 hefteyan borî. Hikûmeta Edouard Balladur li hemberî livbaziyên cotkar, karker û xwendekaran hinek biryarên xwe vekişandin.

Edouard Balladurê ku xwe wekî berendamê serokkomariyê jî nîşan daye, bi polîtîkayên xwe rika kedkaran dikişîne ser xwe.

**Nûçeyên Derve**



**Edouard Balladur**

Di pêvajoya mehekê de;

# 6 rojnameger hatin kuştin

Ajansa Iter Tass'ê daxuyand ku di nava mehekê de, li Welatên Civata Dewletên Serbixwe (Yekîtiya Sovyetê ya berê) de 6 rojnameger hatine kuştin. Li gorî vê agahiyê li Rûsyayê 4, li Kirgizîstanê 1 û li Azerbeycanê jî rojnamegerek hatiye kuştin. Weqfa ji bo Parastina Glasnotê ku agahî daye ajansê balê dikişîne ser astengên ku Serokê Rûsyaya Spî Aleksander Lukuşenko derdixe pêşberî rojnamegeran û rewşa 3 rojnamegerên ku li Azerbeycanê van rojên dawî hatin girtin.

Li aliyê din li ser sînorê Afganîstan û Tacikîstanê mîlîtanên îslamî êrîş birin ser meferên parêzkarên sînor, 3 heb kuştin û 15 heb jî birîndar kirin. Ev bûyer roja 11'ê avrêlê pêk hat, piştî êrîşê li gorî agahiyên ku rayedarên leşkerî yên rûs dan, wan jî 2 helîkopter şandine ser mîlîtanan û ji wan 17 kes kuştine. Piştî ku li Tacikîstanê di sala 1992'yan de şerê hundirîn derket, li gorî peymaneke di navbera Civata Dewletên Serbixwe de hêzeke ku ji leşkerên van dewletan pêkhatibû li ser sînorê di navbera Tacikîstan û Afganîstanê de bi cih bûn. Sînorê di navbera her du dewletan de çiya ne û ji bo derbasbûna hêzên îslamî hêsan e.

Peywirdarên Neteweyên Yekbûyî ji bo navberdîtinê dixebitin, lê hêj tu encam bi dest nexistine. Çend biryarên agirbestê têk çûbûn ku hêzên muxalif hilbijartina îsal bi îdiaya nedadbûnê protesto kiribûn. Ji 7'ê mehê bi vir ve di şerê hêzên îslamî û leşkerên sînorparêz (piraniya wan leşkerên rûs in) de nêzî 150 kes hatine kuştin.

# Çekên NATO'yê

Piştî ku roja 20'ê adarê artêşa tirk kete nava erdê Başûr, dewletên ewrûpî reaksiyonên cur bi cur nîşan dan. Reaksiyona herî tûj ji Almanyayê hatiye. Ev tişt dibe ku hinek mirovên me bixe nava gumanê. Ji ber ku dewleta alman bi dijminatiya gelê kurd tê nasîn û dewleta tirk piraniya çekên xwe ji wê dewletê temîn dike. Li gorî nûçeyeke rojnameya The European'ê di rojeva NATO'yê de dîsa hinek endamên xwe biçekkirin heye. Navê Yunanîstan, Tirkiye, Portekîz, Norweç û Danimarkayê tê telafûz kirin. Di nava van dewletan de ya ku wê herî zehf çekan bîstine Tirkiye ye.

Li gorî nûçeyê peymana ku di navbera NATO û Rûsyayê de hatibû îmzekirin, NATO'yê mecbûr dihêle ku xwe ji hinek çekan xelas bike. Ev jî wan bêpere dide endamên xwe yên ji aliyê çekan ve qels. Ji ber vê yekê NATO'yê bi tenê di sala 1993'yan de 1017 tank, 600 lêsiwarên bizirh û 70 topên giran dane Tirkiyeyê. Li aliyê din Almanyayê heta niha 300 tankên Almanyaya Rojhilat, zêdetirî 250 hezar keleş, 100 hezar roketên antî-tank, 100 tankên leopard, 45 balafirên fantomê, 131 çekên erdê firotine dewleta tirk. Ew jî dide zanîn ka li pişt dagirkerên tirk kî hene. Heke wisa ye, gelo divê mirov vê reaksiyona ewrûpiyan, bi taybetî ya Almanyayê çawa şîrove bike? Çend sedemên ku tên hişê min ez dixwazim li xwarê rêz bikim:

1) Nakokiya ku di navbera hêzên împeryalîst de heye

2) Dewleta tirk guh nade tu qeydeyên navneteweyî. Ew dixwazin ku Tirkiye karê xwe bi hostatî bike, hinek gavan biavêje lê Tirkiye bêyî kuştin û qirkirinan tu gavan navêje. Mesela li gorî qeydeyên NATO'yê ew nikare van çekan di şerê hundirîn de bi kar bîne, lê Tirkiye bi awayekî eşkere bi wan çekan gelê kurd dikuje.

3) Doza gelê kurd êdî bûye navneteweyî, xabetên gelê kurd ên dîplomatîk, bêhna dewlata tirk diçikîne û piştgiriya gelê ewrûpî distîne. Wekî mînak lêpirsînên li Almanyayê nîşan didin ku ji deh kesan 7 kesên alman,Tirkiyeyê wekî dewleteke nedemokratîk dinirxînin.

**SAMÎ BERBANG**

# Emiliano Zapata hate bi bîr anîn

Di salvegera kuştina 76'an a serhildêrê navdar Emiliano Zapata de li Meksîkayê xwepêşdanên girseyî li dar ketin.

Li Mexico City'yê bi banga Tevgera Proletarya ya Serbixwe (MPI) roja 10'ê avrêlê zêdetirî 50 hezar kesî bi xwepêşdaneke daxwaza Zapata ya ji bo "Erd, dad û azadiyê" bilind kir. Di xwepêşdanê de berdana pêşevanê MPI'yê ku niha di girtîgehê de ye jî hate xwestin.


Li aliyê din bi pêşengiya dilxwazên EZLN'ê, li Chiapass'ê xwepêşdanên girseyî çêbûn. Gerîlayan hinek avahiyên fermî û îstayona radyoyê bi dest xistin.

Emiliano Zapata di sala 1910'an bi daxwaza erd, dad û azadiyê rêberiya serihildaneke gundiyan kiribû. Zapata di 10 avrêla 1919'an bi fermana Serokê Meksîkayê yê wê demê Carranza hatibû kuştin. Di destpêka sala 1994'an de Artêşa Rizgariya Neteweyî ya Zapatistan (EZLN) bi eynî daxwazan li eyaleta Chiapassê dest bi serhildaneke nû kir.

**Nûçeyên Derve**



**Serhildêrê navdar: Emiliano Zapata**



# Li Bangladeşê karkeran rê birîn

Piştî du rojên grevên siyasî yên li dijî hikûmetê bi daxwaza hilbijartina zû, li Bangladeşê roja 11'ê avrêlê Eniya Demokratîk a Çepgir banga greva giştî kir. Ev bang ji bo piştgiriya sendîkayên bi daxwaza zêdebûna meaşan rê bi karkeran dida birîn, çê bû. Rêbirîna karkeran li Bangladeşê çûn-hatin gelek bi zehmet kir, gelek kes negihîştin cih karê xwe û gelek suxre nehatin cih.

Roja 10'ê mehê hîn greva partiyên dijber a ji bo hilbijartina zû nû qediya bû. Serokwezîr Xalîda Ziya naxwaze hilbijartinê li dar bixe, ji ber vê yekê partiyên siyasî mleclîsê protesto dikin û livbaziyên cur bi cur li dar dixin.

**Nûçeyên Derve**

# Gelê Arnavûd sosyalîzmê dixwaze

Li gorî lêpirsîneke dorfireh a rojnameya Koha Yoni ango 'Dema Me', gelê arnavûd ji sîstema nû eciz bûye û bêriya sosyalîzmê kiriye. Lêpirsîn dide zanîn ku ji sedî 52'yê hilbijêran wê di hilbijaritneke nû de dengê xwe bidin Partiya Sosyalîst ku wekî dûmahîka Partiya Ked a Arnavûdê tê binavkirin. Li gorî lêpirsînê rêjeya reyên partiyên rastgir tevan nagihîje ji sedî 35'an.

www.arsivakurd.org

# FAL

**BERAN (21 Adar - 20 Avrêl)**

Ahê bizina kol ji ya biqiloç re namîne. We pir zilm li zar û zêçên xwe kiriye. Ji ber hinek hestên we yên feodal êdî giramgiriya wan bi we nemaye. Divê hûn dest biavêjin karê malê, alîkariya maliyên xwe bikin.

**GA (21 Avrêl - 21 Gulan)**

Bihar hat, zivistan hilat. We hêvî dikir ku hûnê ji derdê dûxana sobeyê xelas bin. Lê sirûştê careke din kenê xwe bi we kir û hûn xistin ber wî karê giran. Divê hûn hinekî sebir bikin, bêhnfirehî wê rûyê we geş bike. Dilê dostan nehêlin.

**CÊWÎ (22 Gulan - 21 Pûşper)**

tim Baran dibare erd xwe dipesine. Şansê we li siwar e. Hûn destê xwe diavêjin çi karî pêk tê. Lê hinekî jî li hevalên xwe yên bextereş binêrin û jê îbretê bigirin. Tim karê mirov rast naçe, hinekî nefsbiçûk bin.

**KEVJAL (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)**

Bi got–gotê mirov naçe cot. Zimanê we dirêj e, lê di warê kar de hûn pir qels in. Her çiqas di pratîkê de hûn nikarin kevirekî bidin ser kevirekî jî bi gotinê hûn karin kelayên xweşik lê bikin. Hinekî li ser estetîkê bixebitin, dibe ku hûn bibin çîrokvan.

**ŞÊR (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)**

Çavê tirsiyayî xwelî zû dikevê. Hûn tim xwe ji nexweşiyan diparêzin, lê mixabin hûn berî herkesî nexweş dikevin. Bêtirs karê xwe bikin û biçin ser xêrnexwezan, pêşeroja we ronahî ye.

**SIMBIL (24 Gelawêj - 23 Rezber)**

Darê stûr nabe kopal. Hûn mirovekî/e serbilind in, her çiqas zorê li we bikin jî hûn serî natewînin. Vê helwesta xwe bidomînin, li hemberî dostan serhişk nebin. Wê dara ber mala we kulîlkên sor bide.

**MÊZÎN (24 Rezber - 23 Kewçêr)**

Emrê ku çû, nede dû. Hûn li rojên xwe yên berê difikirin, ew rojên ku di nava tengasiyê de derbas bûn jî bi we pir xweş tên. Ewqas nostaljîk nebin, ji gelek aliyên ve îro ji berê çêtir e. Derkevin nêçîra guran.

**DÛPIŞK (24 Kewçêr - 22 Sermawez)**

Kes nabêje: "Dewê min tirş e." Hûn beredayî hêvî dikin ku hin kes li xwe mikur bên û xwe rexne bikin. Ji aliyê taktîkan ve ji hevalekî/ê alîkariyê bixwazin. Xwe ji paşgotiniyan biparêzin.

**KEVAN (23 Sermawez - 21 Berfanbar)**

Ku te girt bernede, ku te berda bi pey nekeve. Derfetên ku tên ber destê we ji ber zexeliyê ji dest diçin. Pişt re jî hûn bi rojan li ber xwe dikevin, dermanê nexweşiya we xebat û dîsîplîn e. Xwe ji deriyê mezin biparêzin.

**KARIK (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)**

Li ber bayê kesî nekevin. Hûn pir zû baweriya xwe bi xelkê tînin lê ew ne dostên jidil in. Bi hevalên doza xwe re bibin dost. Ji ber gotinekê wê felaket were serê we, hay ji xwe hebin.

**DEWLIK (21 Rêbendan - 11 Reşemî)**

Mêş li damêşê datîne. Hûn ji hevalên hevalekî xwe zehf aciz dibin, lê hûn qet li ser rengê hevaliya xwe û wî kesî nafikirin. Biçin serdana lêzimekî xwe yê girtî, hûnê pir tiştan hîn bibin.

**MASÎ (20 Reşemî - 20 Adar)**

Serê sax balgîvê naxwaze. Van rojan hinekî siheta we ne baş e. Divê hûn li xwe binêrin, guh bidin şîretên maliyên xwe. Wê mesajek ji we re were, zû kêfxweş nebin, dawiya wê ne bixêr e.



# Mişkê ku eslê xwe înkar dike

Rojekê mişk di nava malê de li xwarinê digere. Dema dihere nava firaqan, dikeve beroşê, dinihêre ku beroş tije ava zêr e. Ji beroşê derdikeve, lê belê tevde dibe ava zêr. Pir kêfxweş dibe û dide lotikan. Dibêje: "Ez êdî bûm mişkezêrînî, ez pir mezin bûm, cihê min êdî ne ev der e, divê herim nava dewlemendan, ez nema di nava mişkan de disekinim." Pirî difikire, dibêje: "Pêwist e pêşî ez bizewicim. Di dema ku difikire de teqîn ji asîmanan tê, brûsk davêje. Mişk ditirse, lê belê dibêje: "Ev mezinê kaînatê ye. Ezê herim cem wî qîza wî jê bixwazim." Dikeve rê, dihere cem brûskê û dibêje:

– Ey brûsk, ez mişkê zêrînî me, tu jî mezinê kaînatê yî, ez dixwazim bi qîza te re bizewicim.

Birûsk dibêje;

– Na, mezinê kaînatê ne ez im. Ewr ji min mezintir e ew nebe ez jî çênabim, here cem ewr.

Mişk dimeşe dihere cem ewr û jê re dibêje: "Divê tu qîza xwe bidî min." Ewr jî jê re dibêje: "Mezin ne ez im, ê mezin ba ye, dema ba tê min ji hevdu parî parî dike û berdide, here cem wî." Mişk dîsa dikeve rê dihere cem bê û jê re dibêje: "Ezê bi qîza te re bizewicim." Ba jî jê re dibêje:

– Ez ne yê mezin im. Ê ji min mezintir hene. Binêre ev tehta xuya ye ev çend hezar sal in ku ez lê didim, lê belê ez nikarim pariyekî jê bikim. Ew ji min mezintir e.

Mişk dihere cem tehtê: "Ez mişkê zêrînî û tu jî mezinê kaînatê, ez dixwazim bi qîza te re bizewicim." Taht jê re dibêje:

– Na ez ne mezinê kaînatê me, yê ji min jî mezintir hene.

Mişk dibêje:" Ma gelo kî ye ev ê ji te mezintir? Tuyê ji min re bibêjî." Teht bi guhê wî digire û dibêje:

– Binêre di bin reha min de mişkek heye û bin min dikole. Ev çend hezar sal in ku kesî pariyek ji min neqetandiye lê belê ew mişk di demeke kin de wê min biqulipîne. Here cem wî ew mezin e. Mişkê me pişta stûyê xwe dixwirîne û dihere nava qewmê xwe.

**ÇIYA MAZÎ**

# Nakim te

Li derdorên Midyadê çend gundên mihelmiyan hene ji ber ku ew û kurd têkilê hev in û dan û standina wan bi hev re heye, li hev çerax bûne, Keç dane hev û ji hev zewicîne.

Tinaz û henekên ku kurd û mihelmî li hev dikin bi nav û deng in. Bi taybetî mehelmiyên ku bi kurdî dipeyivin gelek caran dikevine xeletiyên mezin. Ew jî di nava kurdan de belav dibe dibe pêkenoka gel.



Mele Silhedîn (rehme lê be) ji Halexê bû. Gelekî şareza û henekoyî bû. Pêncî û pênc salî bû û jina wî mîribû. Ji xwe re li jinikeke digeriya. Yekî jê re li gundekî mihelmiyan salox dan. Rabû rê girt û çû wî gundî ew li ser çûna xwe wiha dibêje: "Êdî ez çûme hundir. Bavê wê û wan ez fermo kirin û ez rûnandim. Gelekî qedir bi min dan. Ez jî çavê xwe li jinikê digerînim. Min dît derî vebû û yek kete hundir. Tiştê ku bala min kişand çavekî wê tunebû. Dema min têr bala xwe da rûyê wê tev kortal bûn. Aliyek ji pozê wê jî xurimî bû. Dema ber bi min ve hat û meşiya min nêrî ku lingê çepê bihostekê ji yê rastê kintir e. Êdî meşa wê wekî reqsa lorê bû, hat û hat li derba min sekinî. Têr nêriya û min dît ji dehma xwe de got: "Wele ez nakim te" edî ma ez li çi digeriyam, min jî got: "Ê wele ez tu carî nakim te."

Nîşe: Mihelmî bi eslê xwe ereb in. Ew Zimanê kurmancî jî li gorî zimanê xwe bikar tînin. Bi piranî zayeda navan û biwejan çewt bikar tînin. Loma li dewsa ku bibêje: "Ez te nakim!" de "Nakim te!" bi kar aniye.

**JÎR DILOVAN**

www.arsivakurdi.org



## 16 hezar yewnanî ji bo Kurdistanê stran gotin

**Di konserê de gelek hunermendên yewnanî, hunermedê ermen Aram Tîgran û Koma Berxwedan bi stranên xwe cih girtin. Stadyûm bi wêne, portre û hwd. hatibû xemilandin. Li salonê ala ERNK'ê û Yewnanîstanê yê herî mezin bal dikişandin ser xwe.**

Li paytexta Yewnanîstan Atînayê roja 8'ê avrêlê li Stada Aştî û Dostaniyê şahiya konsereke bi sernava "Yewnanîstan ji bo Kurdistan'ê strî" bi beşdariya 16 hezar yewnanî hate pêkanîn. Ev konser ji aliyê 10 belediyeyan, Komeleya ENOSÎ û şaxê ciwanan ê 4 partiyên siyasî ve hate organîzekirin.

Di konserê de gelek hunermendên yewnanî, hunermedê ermen Aram Tîgran û Koma Berxwedan bi stranên xwe cih girtin. Stadyûm bi wêne, portre û hwd. hatibû xemilandin. Li salonê ala ERNK'ê û Yewnanîstanê yê herî mezin bal dikişandin ser xwe. Di konserê de Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan mesaja xwe di ekrana stadyûmê ya mezin de xwend. Öcalan di mesaja xwe de got ku Şoreşa Kurdistanê ji bo Yewnanîstan û Qibrisê sebebeke emniyetê ye. Xwediyê du çandên herî kevin yewnan û kurd divêt têkiliyên xwe bi hev re xurtir, germtir bikin. Piştî mesaja Öcalan mesajên ERNK'ê Ewrûpa û ERNK'ê Balkanan hate xwendin. Di mesajên ERNK'ê de hate gotin ku îro Yewnanîstanê ji bo Kurdistanê stranan dibêje, sibê Kurdistana azad wê ji bo Yewnanîstan stranan bibêje.

Gelek şexsiyetên yewnanî yên wekî Wezîrê Karê Peywirdeyî yê berê û Parlamenterê PASOK'ê Lefteris Verivakis, Wezîrê Ragihandinê yê berê û Parlamenterê PASOK'ê Kostan Badovvas, Parlementerê Partiya Demokrasiya Nû Panaitotis Kammenos, Berpirsiyarê Karê Derve yê Partiya Yekîtiya Çepgir Panos Trigazis û gelek serokên belediyeyan beşdarî konserê bûn. Li ser navê Parlamentoya Kurdîstanê ya li Derveyî Welêt jî di konserê de Zübeyîr Aydar axivî. Aydar di axaftina xwe de got; "Tava azadiya Kurdistanê dinyayê ronahî dike. Ez li ser navê gelê kurd silavên germ li gelê yewnan dikim." Şev bi stran û axaftinan, bi coşiyeke mezin qediya.

**Welatê Me Kurd–A**

### Artêşa tirk ji başûrê Kurdistanê hêzên xwe hêdî hêdî vedikişînin

# Navekî din ê têkçûnê: Vekişîn

Hêzên artêşa Tirk, di 9'ê avrêlê de dest bi vekişîna ji başûrê Kurdistanê kirin. Li gorî agahiyan, hêzeke Tirk ku ji 3 hezar leşkerî pêk hatibû, gihîşt Silopiyê. Rayedarên artêşa Tirk dibêjin ku, wê artêş li gorî teqwîmekê, di nav 15 û 30 rojî de ji Kurdistanê vekişe.

Îşxalkirina başûrê Kurdistanê di 19'ê adarê de dest pê kiribû. Di vê îşxalê de 60 km. li ser panbûnê û zêdeyî 300 km. jî li ser firehiyê erda Başûr bûbû hedefa hêzên Tirk.

**Vekişîn çiqas rast e?**

Rayedarên leşkerî piştî vê vekişînê, didin zanîn ku hêzên wan li gelek deverî gihîştine armanca xwe. Di daxuyaniyên leşkerî de tê gotin ku wan kampên gerîla rûxandine û xistine halê ku careke din neyê bikaranîn. Sebeba vegera jî, serkeftina li hemberî gerîla rê didin. Lê li gorî çapemeniya dinyayê encama îşxalê fiyasko bû. Ji hêla din ve gelek çavkanî vê vekişînê sembolîk dibînin û sebeba wê jî reaksiyona raya giştî ya dinyayê ku li hemberî dewleta Tirk hate nîşandan, rê didin.

**Gerîla: Artêşa tirk têk çû**

Der barê îşxalkirina başûrê Kurdistanê û zerara artêşa Tirk de, Buroya Çapemeniyê ya Qerargeha Navendî ya ARGK'ê, daxuyaniyek weşand. Di daxuyaniyê de tê gotin ku artêşa Tirk, ji roja (19 adar) ku ketine Başûr û heta niha (4 avrêl) bi sedan leşker zaiyat daye. Li gorî daxuyaniyê bi dehan gundê Başûr hatine valakirin û gelek gundî ji aliyê artêşa Tirk ve hatine qetilkirin.

Li ser vekişîna artêşa Tirk jî çavkaniyên gerîla didin zanîn ku, ew bi kemînan û êrîşan, derbeyên gelek mezin li artêşa Tirk xistine.

Piştî vekişîna mecbûrî, rayedarên dewletê li ser planan difikirin ku ew hêzên xwe li başûrê Kurdistanê bihêlin. Navê vê hiştinê jî, li gorî çarçeweyeke hiqûqî bi dinyayê bidin qebûlkirin. Ji bo vê yekê, rayedarên dewletê di rojên ewilî de dixwestin bi awayekî hêzên Sedam Hüseyin têxin başûrê Kurdistanê. Lê ev plan ji ber ku ne bi kêfa Amerîka û hevalbendên wê bûn, neçû serî. Rayedarên dewletê dîtin ku ev senaryo nameşe, vegeriyan ser senaryoyeke din. Li gorî vê planê, artêşa Tirk û hêzên başûr ji bo ewlehiya Tirkiyeyê wê "herêmeke tampon" li hidûd çêbikin. Bicihbûna vê senaryoyê jî zor tê xuyakirin, lewre di sala 1992'an de jî peymaneke bi vî rengî hate îmzekirin, lê li başûrê Kurdistanê ji bo ku sempatiya gel ji PKK'ê re hebû, ew plan nemeşiya. Plana ku îro dewleta Tirk dixwaze çêbike, tekrara ya 92'yan e, yanî ji bêçaretiyê mecbûrî vê "Plana Herêmî" bûye.

Ji hêla din ve hêzên başûrê Kurdistanê, zû bi zû nikarin xwe bidin ber hewcedariyên peymaneke wiha. Ji ber ku di halekî wiha de gel û pêşmerge, li dij birakujiyê derdikevin û sempatiya PKK'ê di nav gel de bêhtir dibe.

**Heyeta Amerîka û navneteweyîbûna meseleyê**

Berpirsiyarên dewletê, li dû îşxalkirinê, ji bo ku reaksiyona raya giştî ya dinyayê kêm bike, Alîkarê Serokwezîr Hikmet Çetin û Wezîrê Karê Derve Erdal Înönü jî di nav de gelek heyet şandin Ewrûpayê û Amerîkayê. Niyeta rayedarên dewletê ew bû ku bi van geran hikûmet, çapemenî û raya giştî ya van dewletan li ser îşxalê, li gorî fikr û berjewendiyên xwe wan agahdar bike û vê yekê wek operasyoneke xweparastinê nîşan bidin.

Lê encama van têkiliyan, ne li gorî dilê berpirsiyarên dewletê bû. Heyeta hikûmeta Amerîkî di serê hefteya borî de, ji bo vê meseleyê li Enqereyê bû û ji rayedarên dewletê daxwaz kirin ku ew heyetên biyanî, wek mînak Rêxistina Ewlehî û Hevkarî ya Ewrûpayê (REHE) ji bo vekolînan, li Tirkiyeyê qebûl bikin. Di vê heyetê de Musteşarê Wezîriya Derve Strobe Talbott, Alîkarê Wezîrê Derve Richard Halbrooke û ji Wezîriya Parastinê Joseph Nye û Jan Lodal hebûn. Yanî mesele, bêyî îradeya dewleta tirk, bûye navneteweyî.

Ji hêla din Xaça Sor ya Navneteweyî jî bi rayedarên dewleta tirk re ketin têkiliyê û ji dewletê daxwaz kirin ku ew di şer de li gorî Peymanên Şer ên Cenevreyê hereket bikin.

Li ser van qewimînan hîna jî çapemeniya Tirk, wek berpirsiyarên dewletê, dibêjin ku operasyon (îşxal) biserketiye û pesnê artêşê didin.

**Navenda nûçeyan**



**Li gorî agahiyan dema îşgalê nêzîkî 1000'î leşker hatine kuştin.**

## Leşker li kemîna gerîla qelibîn: 48 mirî

Gerîlayên ARGK'ê roja 6'ê avrêlê, hêzên artêşa tirk ên ji Herêma Înişkê vedikişiyan xistin kemîna xwe. Di cerda gerîlayen de 48 leşker mirin û, 3 leşker birîndar bûn, gerîlayan dest danîn ser gelek malzemeyên cur bi cur. Hêzên artêşa tirk ên ku ji Herêma Înişkê vedikişiyan di navbera Kanî Masî û Zapê li warê Tirwaniş ketin kemîna gerîlayan. Di êrîşa gerîlayan yê yekemîn de 2 leşker mirin, 3 leşker birîndar bûn. Gerîlayan di êrîşa duyemîn de, ji sê milan ve êrîşeke dijwar birin ser leşkeran û di êrîşê de 6 leşker mirin. Dîsa li eynî herêmê gerîlayan dora hêzeke artêşa tirk girt û banga teslîmiyetê lî wan kir. Leşkeran bi sîlehan bersiv dan. Gerîlayan êrîşên dijwar birin ser leşkeran. Di van êrîşan de serbazek, astsubayek û nêzîkî 40 leşker û gerîlayek bi navê Îshak mirin. Gerîlayan di vê êrîşê de dest danîn ser 3 MG-3 û 2 hezar gule, 7 G3 û şarjor, roketeke 3-7, 3 sîlehê lavê û 3 bêtêlên destan.

**Kurd–A**

## LI GORÎ ANKETA KOMELEYA MAFÊN MIROVAN YA LI SER KURDÊN KOÇBÛYÎ

# KURD DIXWAZIN VEGERIN WELATÊ XWE

**Berê çi bi awayê vêşarî û çi jî eşkere gelê me dihate koçkirin. Mirovên zane û rewşenbîr sebeb dizanibûn, lê gel? Gel di xizaniyeke wilo de bû ku, tenê di hişê wî de gepek nan hebû. Ji ber vê yekê malxweyê malê an bi serê xwe an jî tevî malbata xwe eşyayên xwe dikirin ding û berê xwe didan xerîbiyê.**

Koçbûn, talanbûn, dûrxistina ji cih û war, kuştin, şewitandin, girtin, tehde, êş, lêdan, îşkence û.... ev hemû peyv ji gelê me re wisa nas in ku êdî hewcetî ji tarîfkirina wan re nîn e. Gelê me hingî famberî xwe bûye, bi van rewşan re rû bi rû maye.

Êş û kula biyaniyê (xerîbiyê), di stran û kilamên vî gelî de cihekî welê ji xwe re veqetandine ku, hew ji wan derdikevin. Belê ev gelê hanê tu car xweşî ji xwe re nedîtiye. Kî dizane belkî dema ku xweşî li gelan hatiyê belavkirin, ev gelê bindest û sitembar (mezlûm) hatibe jibîrkirin. Hûn çi dibêjin...?

Berê çi bi awayê vêşarî û çi jî eşkere gelê me dihate koçkirin. Mirovên zane û rewşenbîr sebeb dizanibûn, lê gel? Gel di xizaniyeke wilo de bû ku, tenê di hişê wî de gepek nan hebû. Ji ber vê yekê malxweyê malê an bi serê xwe an jî tevî malbata xwe eşyayên xwe dikirin ding û berê xwe didan xerîbiyê.

Vê rewşê, hedî hêdî dikir ku kurd dev ji welatên xwe berdin û deverên biyan ji xwe re bikin war. Bi hinceta ku zikên xwe têr bikin! Gava diçûn van deverên biyan, mîna Edene, Mersîn, Îzmîr û Stenbolê rastî gelek gelşan (probleman) dihatin. Zimanekî biyan, çandeke biyan, erf û adetên biyan, dan û standinên biyan. Ji serî heta binî, hemû tişt biyan bû ji wan re....

Erê, ev malbat bere bere di wê deryayê de noq dibûn. Lê van salên dawî leşker wekî kuliyan li ser serê gelê kurd bariyan. Bi gotineke zehf kin û têrmane; bi hindikî, 2500 gund xir û xalî bûn. Bobelatên mezin anîn serê gel. Ev yek ji ber xwe ve nediqewimî. Fermana çepelan a bi navê "kokê li wan bînin, wan biqelînin" dianîn cih. Ev rewş encama siyaseta dewleta tirk bi xwe ye, jê re tu îzeh ji ne lazim in.

Kurdan vê carê jî, ji neçarî berê xwe dan bajarên giran; wekî Edene, Antalya, Mersîn, Îzmîr, Stenbol û Îzmîtê. Hem jî bi hejmareke zehf mezin ji Edeneyê heta Stenbolê ber û berê Behra Spî (Akdeniz) ji xwe re kirin war. Li van bajar û navçeyan (qezayan) giraniyeke wan çêbû. Serokê Tevgera Demokrasiya Nû (YDH) Cem Boyner êdî bi devê xwe dibêje ku "Bajarê herî mezin ê kurdan di cîhanê de Stenbol e. Nifusa wan zêdetirî 2 milyon û nîv e." Heta ev rewşa hanê, dibe sebebê munaqeşkirina polîtikaya dewletê ya koçkirin û valakirina gundan.

Lewre tirsa kesên nola Cem Boyner ev e ku, dewlet bi destê xwe agir berî barûdê dide. Bûyera Taxa Gaziyê ji vê yekê re mîna nimûneyeke girîng û balkêş nîşan didin.

Mebesta min, di vir de ne şîrovekirin û nirxandina polîtikayên dewletê ye. Rapora Komisyana Mafên Kurdan a Şaxê Komeleya Mafên Mirovan a Stenbolê (İHD) kir ku ez hinekî li ser vê rewşê bisekinim.

Komisyona Mafên Kurdan ya KMM'ê di rêbendana (çile) 1995'an de encama enketa xwe weşand. Komisyana Mafên Kurdan, li ser malbatên kurd ên ku koçî Stenbol, Mersîn û Bursayê bûne, lêgerînek



Berê kurdan ji ber "xizantiyê" koç dikirin bajarên giran û biyan, îcar jî bi darê zorê ji cih û warên xwe tên qewirandin.

● Komisyona Mafên Kurdan ya KMM'ê di rêbendana (çile) 1995'an de encama enketa xwe weşand. Komisyana Mafên Kurdan, li ser malbatên kurd ên ku koçî Stenbol, Mersîn û Bursayê bûne, lêpirsînek çêkiriye. Her çiqas xwestine ku li herêmeke fireh xebata xwe pêk bînin jî, îmkanên wan têrî nekiriye. Tenê li her sê bajarên ku li jor navên wan derbas bûn, karibûne xwe bigihînin miradên xwe. Ev jî heye, mebesta wan ew bûye ku bi nûnerê 500 malbatî re têkiliyê deynin.

çêkiriye. Her çiqas xwestine ku li herêmeke fireh xebata xwe pêk bînin jî, îmkanên wan têrî nekiriye. Tenê li hersê bajarên ku li jor navên wan bihurîn, karibûne xwe bigihînin miradên xwe. Ev jî heye, mebesta wan ew bûye ku bi nûnerê 500 malbatî re têkiliyê deynin.

Di rapora xwe de dibêjin ku, leqayî gelek asteng (manî) û gelşan hatine. Hem kesên ku anket çêkirine ne xwediyê tecrûbeyan bûne û tengasiyên wan ên madî hebûne, hem jî malbatên koçbûyî li qadeke mezin belav bûne. Lewma xwe bi rihetî negihandine wan. Ji aliyê din ve jî malbat tirsiyane ku bi van kesan re bipeyivin û pirsan bibersivînin. Bi alikariya kesên nas û bi metodeke rastlêhatî anket hatiye çêkirin. Komisyon di raporê de dadixuyîne ku malbat pir bi endîşe û tirs bûne. Ji vê rewşê re nimûneyeke wiha dide: "Li vir jî bigirin ser mala min, xaniyên min bişewitînin, min an jî zarokên min bikujin, wê kî ji wan re bibe manî?"

Anket ji 40 pirsan pêk hatiye û bi nûnerên 341 malbatî re hatiye çêkirin. Lêgerin 3258 kesî dihewîne. Divê ev bê gotin ku xebatê nezîki heft mehan domandiye. Tiştekî din heye û hejayê gotinê ye, der barê vê anketê de Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê (DGM) doz vekiriye. Gava ku bi destê saziyeke dewletê, xebatên wiha bêne kirin û encamên wan bêne weşandin û daxuyandin, tu tişt nabe û naqewime. Gelş dernakevin, lê ku yên din bin; îcar rewş xerab e.

Gelek pirsên girîng ji beşdarên anketê hatine pirsîn; ji devera ku jê hatine heta bi temen (emr) û rewşa wan a hêvotinê (perwerdehê), ji debara wan heta bi gelşên wan ên civakî, aborî, neteweyî û daxwaz û meylên wan.

Piştî ewqas agahî, ez dixwazim bi sernavan hin encamên vê xebata hêja diyar bikim.

### Sebebên Koçkirinê

Kesên koçbûyî, %71,6'ê wan ji gundan in, û ji ber siyaseta valakirina gundan a dewleta tirk dev ji gundên xwe berdane. %58 kes sebebê koçê bi hebûna şer ve, %15 bi tunebûna ewletiyê û %8,7 jî bi sebebên din ve girê dane.

Li gorî encamên anketê malbat bi hejmareke mezin di sala dawîn de hatine koçkirin. Rêjeya (nispeta) wan %54,3 ye. Ev malbat beriya ku bar bikin herine bajarên xerîbiye %90,9'ê wan tehde û muameleyên xerab dîtine. %58,3 diyar kirine ku ji wan girtî, mehkûm û kesên binçavkirî hene.

Ji hêla din ve, %72,9'ê beşdaran dane xuyan ku ji malbatên wan hin kes "di binçav de winda bûne" û ji ber îşkenceyê mirine.

Kesên ku beşdarî anketê bûne beyan kirine ku 38 kes di binçav de, 25 bi cinayetên kiryar nediyar (fail–i meçhûl) û 15 kes jî, ji aliyê cerdevanên (çeteyên) gundan ve hatine kuştin. Ev jî hewceyî gotinê ye, kesên ku koç kirine %53,8'ê wan ji devera xwe ji binî ve koç nebûne û li cih û devera xwe qet nebe kesek hiştine.

### Rewşa ku tê de dijîn

Kurdên ku ji neçarî koçî beyarên giran û mezin bûne, di rewşeke pir nepak de dijîn. Heman heman hemû kesên ku dixebitin bêsîgorte ne û ji ewletiya sosyal bêpar in. Ku nexweş bikevin nikarin herine ser doktorekî/ê, heke herin jî nikarin îlacan bikirin. Ji aliyê tenduristiyê (sihetê) ve rewşa wan ne qenc e. Li ser mijarê ev hejmar hene: %50,6'ê wan neçûne doktor û %53,5'ê wan jî, nexweşîna xwe tedawî nakin.

%83,9 kesên ku dixebin bêsîgorte ne û ji mafên sosyal feydeyê nabînin. Gelek ji wan di xaniyên kolit de (tirk jê re dibêjin gecekondu) dijîn. Ev xanî li guh û perên bajaran dikevin. Ji suxre (xizmet) yên bingehîn û hîmî mîna av, elektrik, rê, nexweşxane, dibistan, selep (Kanalizasyon) û deverên çalakiyên (faaliyetên) civakî bêpar in. Ev rêje %53 ye. Li aliyê din %32'yê wî jî di apartmanan de dimînin. Gelek malbat ne xwediyên radyo, teyp, televizyon, sarger, makineya firakşoyê, telefon û videoyê ne. Ev rêjeya vê yekê jî %45 e. Bi anketê hatiye tespîtkirin ku 10 malbat di inşaatê de û 7 heb jî di dukananan de dimînin.

Malbatên ku beşdarî anketê bûne, %50,2'yê wî xuya kirine ku di malekê de di navbera 6 û 10'an de kes dimînin. % 21,8'ê wan jî di malekê de di navbera 1 û 5'an de kes dimînin.

Ev jî heye, malbatan bi hêsanî ji xwe re xanî neditine. %55,6'ê wî gotiye ku bi alîkariya nas û mirovên xwe xanî bi dest xistine. Ji aliyê din ve %89,1'ê wan jî beyan kirine ku xwediyê xaniyan ji ber kurdbûna wan, xanî nedane wan. Ev niqteyeke zehf balkêş e!.

### Debar û rewşa hêvotinê

Anket bi me dide zanîn ku yên bersiv dane %37,2'yê wan dibistana pêşîn qedandine. %14'ê wan ne xwende ne. Em vê rewşê jî diyar bikin ku rêjeya jin û meran ên ku bersiva anketê dane %81,8'ê wan mêr in, %18,2 wan jin in. Ji van kesan %84,3 beriya dibistanê bi tirkî nizanibûne. Kesên ku anket bersivandine %31,7'ê wan di navbera temenê 31–50'yî û %25,5'ê wan jî di navbera temenê 19–25'an de ne. %48,3 malbatan ji pirsa "zarokên we yên ku hatibin çaxa xwendine û naçin dibistanê hene?" re, bersiva "belê" dane.

Me gotibû ku bi saya anketê em pê dihesin ku malbatên koçbûyî di rewşeke gelek xerab de dijîn. Ji aliyê aboriyê ve jî pir tengazer in. Dahata (hatina) %44,6 malbatan 2 milyon û nîv û %22'yê wan jî di navbera 2,5 û 5 milyonî de ye.

Ev kes li xerîbiyê ne bi pere û hebûna xwe ya berê debarên xwe nakin. %55,3 cotkar bûne. Ji malbatên koçbûyî %64,9'ê wan xwe bi xebatê xwedî dikin. Van kesan ji ber kurdbûna xwe kar neditîne, ev rêje %78,9 e û yên ku ji ber kurdbûna xwe tehde dîtine %88,7 in. Ev jî heye; %71,5'ê wan ji ber nasnameya xwe hatine tehdîtkirin.

### Daxwaz û meylên wan

Di vê beşê de mirov rastî encamên pir ecêb tê. Ji pirsa "Hûn dixwazin vegerin devera ku hûn jê hatine koçkirin?" re, %99,1'î "belê" gotine. Ji aliyê din ve li ser pirsa anketê daxuyandine ku heke di destên wan de be, wê %62,9'ê wan koçî Dewleta Federe ya Kurdî bibin. Dîsa li ser pirsa "Hûn dixwazin koçî kijan welatî bibin" %58'ê wan welatê xwe xwestine.

Werin em dêhna xwe bidin bersiva malbatên kurd, ku ka bi zimanê xwe hêvotinê (perwerdeyê) dixwazin an na? Belê, %79,5'ê wan dixwazin ku zarokên wan bi zimanê zikmakî ango bi kurdî dersê bibînin, bi kurdî bêne hêvotin. Tenê %15'ê wan xwestine ku zarokên wan bi tirkî–kurdî hevotinê bibînin.

Em diyar bikin ku, hemû bersivên pirsan di vê nivîsê de nehatine nirxandin û şirovekirin. Heta bersivên ku me ew hildane destê xwe jî nehatine şirovekirin.

Bi ya min, di rapora Komisyona Mafên Kurdan a şaxa Komeleya Mafên Mirovan a Stenbolê de, bersiva gelek pirsên girîng hene. Çi ji derdorên kurdan re û çi ji derdorên tirkan re ku serê xwe li ser gelşa kurdan diêşînin.

Jixwe rapor qala rewşa kurdên ku koçî bajarên Kurdistanê bûne, nake û bi tenê li ser rewşa kurdên ku çûne bajerên Tirkiyeyê disekine Ji ber şewitandin û valakirina gundan li seriya 3 milyonî kurd hatin koçkirin. Li dora 30 hezarî koçî başûrê Kurdistanê bûne. Hejmareke ku biçûk nayê dîtin bar kirine çûne dewletên Ewrupayê û cihên din.

Lê min divê ez vê niqteyê destnîşan bikim. Li cem ewrûpiyan baweriya ku rojavayê Tirkiyeyê ji bo kurdan bi ewle ye, heye. Encama vê anketê ji wan re jî bersivek e, li aliyê din ve rewşa kurdên ku ji gund û cihên xwe bûne û xwe li bajarên mîna Amed, Batmanê girtine, ji yên wekî li Edene, Stenbol û Antalyayê qet ne çêtir e.

Di dawiyê de em dikarin bi hêsanî bibêjin ku, ev anket dîmeneke pir balkêş a kurdên koçbûyî nîşanî mirovan dide.

ZANA FARQÎNÎ



Hin kurd jî berê xwe dan cem birayên xwe yên Başûrî

DIK

## Gelo wê tîna Heranê bê şikandin?

Serokwezîr û alîkarê serokwezîr ji di nav de berpirsiyarên hikûmetê di 11'ê mehê de ava Feratê berî nava axa Heranê dan.

Li gorî pisporan û rayedarên tirk, projeya Herranê (GAP) hem ji bo Tirkiyeyê û Rojhilata Navîn û hem jî ji bo dinyayê cihekî girîng digire.

Hesabên ku li ser vê projeyê tên kirin ji hesabên li ser Kurdistanê ne cihêtir e. Ev serê 20- 25 salan ku hemû hikûmetên tirk ji bo vê projeyê bi milyaran dolar rijandine û hîn jî tê rijandin. Di vê pêvajoyê de ji çapemeniyê heta rayedarên hikûmetê herkesî li ser vê projjeyê senaryo çêkirin. Qaşo wê bi xêra vê prjojeyê li Kurdistanê bêkarî biqede, şer nemîne û problema Kurdistanê bê jibîrkirin.

Li gorî vê dîtinê kesên ku zikên wan têr e, bala xwe nadin fikrên neteweyî. Li hêla din jî aliyê teknîkî û îklîmî ve jî dewleta tirk tu tedbîrên cidî ne standine.

Herêmeke ku qasî dewletekê ye, wê di nav çend salan de ji hêla îklîmî ve bê guherîn. Nexweşiyên nû yên însanan, yên heywan û zeviyan wê peyda bibin. Li hemberî van nexweşiyan gelo kesek bawer dike ku dewletê tedbîr standine.

Wer xuya ye ku armanca dewletê di nava pêvajoyeke kurt de, qezenceke mezin e . Wekî meseleyên kurdan yên siyasî, aborî û kulturî, ev meseleya muhîm jî bê ku ji kurdan û nûnerên wan bê pirsîn, tê çêkirin. Zaten dewleta tirk kengî derbarê pirsgirekeke de hewce dîtiye ku ji kurdan bipirse?

Belkî Ferat tîna Heranê bişkêne lê gelo problemên Kurdistanê wê bên jibîrkirin ?

**SUUT KILIÇ**



Li gorî agahiyên ku ji Kurd–A'yê re hatine şandin:
"Li başûr û bakurê Kurdistanê, di pêvajoya 15 rojên îşgalê de, 896 leşker mirine"

# Li seranserê Kurdistanê şer e

Şerê di navbera hêzên ARGK'ê û hêzên artêşa tirk de li seranserê Kurdistanê bi dijwarî didome. Ev hefte gerîlayên ARGK'ê li gelek deverên bakur û başûrê Kurdistanê livbaziyên dijwar pêk anîn. Li gorî agahiyên ku ji Kurd–A'yê re hatine şandin, di 15 rojî de 896 leşker, kontra–ajan, cerdevan û 113 gerîla mirine û 102 leşker, kotra–ajan, cerdevan û 26 gerîla jî birîndar bûne.

**6.4.1995**

Li Kanîmasiya başûrê Kurdistanê hêzên dewletê xwestin bi firokeyan alîkariya leşkerên xwe bikin. Li ser vê yekê gerîlayên ARGK'ê bi çekên BKC û B–7 firokeyên dewletê bi paş ve dan revandin.

**7.4.1995**

Gerîlayên ARGK'ê li herêma Haftanînê, li Warê Silo ji çar milan ve êrîşî hêzên dewletê kirin. Di van êrîşan de 31 leşker, 6 cerdevan û 2 gerîla mirin. Leşkeran dev ji mewziyên xwe berdan û bi paş ve vekişiyan.

Li herêma Behdînanê, gerîlayan êrîşî tabûreke seyar kirin. Di cerda gerîlayan de 44 leşker û 3 gerîla mirin, 6 gerîla birîndar bûn. Gerîlayan dest danîn ser gelek malzemeyên cur bi cur.

**8.4.1995**

Hêzên artêşa tirk di navbera Kanîmasî û Zapê de ketin xefika gerîlayan. Di xefika gerîlayan de 2 leşker mirin, 3 leşker birîndar bûn.

Li warê Tirwanişê, gerîlayan cerdî ser leşkerên ku vedikişin, kir. Di êrîşa gerîlayan de 6 leşker mirin.

Gerîlayên ARGK'ê li dora Zaxoyê di geliyekê de dora hêzeke artêşa tirk girtin. Gerîlayan li leşkeran banga teslîmbûnê kirin. Lê leşkeran bi sîleh bersiva gerîlayan dan. Piştî vê yekê di navbera gerîlayan û leşkeran de şerekî dijwar qewimî û di şer de nêzîkî 40 leşker mirin. Birek leşker jî ji ber livbaziyê gerîlayan, dev ji şer berdan û revîn. Piştî vê livbaziyê gerîlayan; 3 çekên MG–3 û berikên wan, 7 çekên G–3 û jarjorên wan, roketekî B–7, 3 çekên lav û bêtêlek bi dest xistin.

Di operasyonên cenga Başûr de, li warê Kanîreşê gerîlayan leşkerek kuştin û 6 leşker jî birîndar dîl girtin.

Artêşa komara tirk 8 mirovên sivîl di newalekê de kuştin.

Li Botanê, hêzên dewletê êrîş dan ser gundên Enîşke û Azadiyê, di wan gundan de 4 welatperêz kuştin.

**9. 4. 1995**

Li Zaxoyê di şerê navbera gerîlayan û hêzên dewletê de 20 leşker mirin, şer hêj jî didome.

Gerîlayên ARGK'ê li Kanîmasiyê dema serêvariyê êrîş dan ser hêzên dewletê, di vê êrîşê de 50 leşker mirin.

**10.4.1995**

Di navbera Amediyeyê û Basyayê de hêzên dewletê ketin kemîna gerîlayan, piştî kemînê di navbera gerîlayan û hêzên dewletê de şerekî giran derket. Li gorî agahiyan, di vî şerî de 5 leşker mirin, gelek leşker jî ji hevalên xwe veqetiyan û winda bûn.

Gerîlayên ARGK'ê li Çelê êrîş dan ser tabûra Şîfrezayê. Di vê êrîşê de gerîlayên ARGK'ê bi çekên hawan û roketan tabûra Şîfrezayê rûxandin. Der heqê mirî û birîndaran de tu agahî bi dest neketin.

Hêzên dewletê li Xaxûrkê ketine kemîna gerîlayan. Piştî kemînê di navbera gerîlayan û leşkeran de şer derket, vî şerî şeveqê dest pê kir û heya êvarê dom kir. Di şer de 4 leşker mirin, 2 gerîla jî birîndar bûn.

Hêzên dewletê avêtin ser gundên li der û dora warê Lelkanê û dest danîn ser çekên gundiyan. Kesekî ku navê wî Ahmet e jî ji aliyê hêzên dewletê ve hate revandin û der heqê aqûbetê wî de tu xeber tunin.

Di sêgoşeya Hênê, Dara Hênê û Licê de, hêzên dewletê li sê deveran ketin xefika mayinên gerîlayan, gelek leşker mirin û birîndar bûn.

**11.4.1995**

Gerîlayên ARGK'ê di navbera Xabûr, Zapê û Kanîmasiyê de komek hêzên dewletê xistin kemîna xwe. Di vê kemînê de 15 leşker mirin, nêzîkî 20 leşker revîn gundên Başûr. Di vê kemînê de gerîlayan dest danî ser malzemeyên cur bi cur.

Hêzên dewletê xwestin operasyona xwe li Çiyayê Cûdî bidomînin. Di meşa hêzên dewletê ya ber bi çiyayê Cudî de gerîlayan bi çekên giran êrîş dan ser wan û ew bi paş ve dan vekişandin. Di vî şerî de gerîlayan çekekî B–7, 2 roket û berikên wan, radyoyek, çenteyek, 4 jarjorên keleşan, 1240 berikên wan, 3 narîncok, 2 nasnameyên leşkeran, 2 matarayê avê û konek bi dest xistin.

Di navbera riya Çiyayê Cûdî û Silopiyê de tankeke dewletê li mayina gerîlayan ya antî–tank qelibî û tevî leşkerên tê de îmha bû.

Gerîlayên ARGK'ê li Erziromê dora qereqola Yedîsuyê mayin kirin. 2 cemsê leşkeran di ser wê re derbas bûn û rûxîn. Ji xeynî wan pir leşkeran jî pêl mayina li der û dora qereqolê kirin, der heqê miriyan de tu xeber tun in, lê birîndar pir in.

Hêzên dewletê li ser riya di navbera Malkişî û Xozatê de pêl mayinê kirin, 4 leşker mirin.

Li Sêgoşeya Licê, Dara Hênê û Hênê, di navbera gerîlayên ARGK'ê û hêzên dewletê de şerekî pir giran qewimî. Di vî şerî de 12 leşker mirin, 2 cemse tevî leşkeran îmha bûn.

Leşkerên qereqola navçeya Dara Hênê ji bo kontrola rê ji qereqolê derketin, bi derketina wan ve lêsiwara wan li mayina gerîlayan qelibî, 13 leşker mirin û 2 leşker jî birîndar bûn.


**12.4.1995**

Li Başûr, li mintiqeya Kanîmasiyê di navbera gerîla û artêşa tirk de şer derket, di vî şerî de teymenek mir, 5 leşkeran jî xwestin teslîmî gerîlayan bibin, leşkerên din ew kuştin. Di vî şerî deçekeke lavê, 2 çekên G–3 û 200 berikên wan, 4 jarjorên G–3'yan dûrebîneke şevê, 5 kon, nexşek, gelek dermanên birînan, berikeke havanê, matarayeke av û pir erzakên xwarinê û vexwarinê gerîlayan dest danîn ser.

Qereqolên mintiqeya li dora Çiyayê Gabarê derketin operasyonê, di vê operasonê de subayekî pêl mayinê kir û mir.

**Welatê Me / KURD–A**

## Li başûrê Kurdistanê bêhna provokasyoneke din



**Li nêzîkî Zaxoyê stasyoneke petrolê tê dîtin.**

Roja 6'ê avrêlê saet nêzîkî 20.00'an li derveyî Zaxoyê, erebeya Mele Îrfan (ku xwediyê Loqenteya Hewalê ye) bi guleyên top û hawanan parçe bû. Di erebeyê de 9 kes tevî zarokan mirin. Bûyer li warê di bin kotrola leşkerên tirk de çêbû. Piştî bûyerê bi nîv saetî leşkerên tirk hatin cihê bûyerê û xwestin ku êrîşê bixin stûyê gerîlayên ARGK'ê.

Xelkê herêmê gotin: "Ne mimkûn e ku gerîla werin û bi rehetî livbaziyê li vê herêmê bikin. Ev herêm di bin kontrola artêşa tirk de ye û bi tank û topan tê parastin."

Mele Îrfan di nava xelkê de wekî welatparêz dihat naskirin û di meşa protestoya qetlîama Zaxoyê de jî cih girtibû. Li aliyên din jî li Zaxoyê, di avahiyê turkmenan de tevgerek balê dikişîne. Di van avahiyan de serbazên artêşa tirk û endamên MİT'ê tên dîtin tê gotin ku piştî îşgalê, komara tirk dixwaze bi destê turkmenan provokasyonan derxe û êrîşî sivîlan bike.

**Kurd–A**

www.arsivakurdi.org

## Di mijara alfabeya kurdî de dîtineke cihêreng

# Divê alfabeya me bibe 40 tîp

Em dixwazin li ser mijareke girîng û hesas ramanên xwe şîrove bikin. Wekî ku ji aliyê her kesî ve tê zanîn, ziman komeleyê ji komeleyên din dide veqetandin, bi heyîna xwe. Bi gotineke din her komele û netewe bi zimanê xwe di nava jîna gerdûnî de belû ye û heye. Zimanê kîjan neteweyî xurt û zengîn û pêşveçûyî be, ew netewe kare bibe xwediyê yekîtî, rêxistin û bi pêşveçûnê.

Ev xisûs ji aliyê neteweyên hişyar ve hê ji berê ve hatiye zanîn û bi vê mebestê, li ziman xwedî derketin, bûye armanca herî pêşîn ji wan re. Dîsa hewce ye mirov bêje ku zanyarên neteweyên bixwedî, bi hişkarî û zanistî temel ji zimanê xwe re avêtine û bi xebatên zanistiyê riya jiyanê lê vekirine.

Îro ev netewe, bi giştî, ne di bin siya rêxistineke neteweyî de ye. Ji ber wê çanda me levakirî, zimanê me bela-wela, aboriya me gelekî qels û welatê me parçekirî ye. Bi vê zanînê divê em di nava xebatên xwenas û neteweyî de ji gengeşiyê re çareseriyê bibînin. Ne ku avahiyeke bêbinyad li ser kêmayî û çewtiyên kevin bidin avakirin.

Niha temelê ziman ji gramer û alfabeyê dest pê dike. Vêca bi encam em karin bêjin ku alfabeya Bedirxanê navdar her çiqas ji berê ve tê îstimalkirin jî, hinek kêmayî û tîpkêmasiyan tê de cih girtine. Sebûneta vê meseleyê, kiras ji aliyê gotin, nivîsîn, berhevkirina peyvan ve û hiştina ji nifşên nû re, li kurdî teng bûye. Eger bi vî awayî seraqetî xwe lê bihêle, wê kurdiya me di gewriyê de can bide. Lewre divê herkesî ramanger û heçî yên têkildar xebatên lezgîn bikin. Divê kesek bi kevinperestiyê miqeris nebe.

Ev çend sal hene ku em bi xweber li ser zimanê kurdî tahqiq û tetqîqê pêk tînin. Li gorî vê ceribîn û prensîbên zanistiyê 40 (çil) tîp di kurdî de hene ku tu çaxî mirov nikare dev ji wan berde. Eger mirov hinekî binê meseleyê bikole, mirov rastê, tê ku gelek ji van tîpan di alfabeyên kevin yên bi kurdî de hene. Em naxwazin ku rewşenbîr tev îlleh vegerin ser alfabeyên kevin. Belê, çare heye ku hemû tîpên pêwist li alfabeya latînî ya kurdî werin zêdekirin.

Bi nimûnetî em karin qelsiyên alfabeya me ya latînî wiha berbiçav bikin. Ev peyvên li xwarê li gorî alfabeya vêga bi nivîsîneke bêbinyat hatine nivîsandin û ji her peyvê re di serî de îcada tîpeke nû pêwist e. Ne bi vî awayî be rizgariya ji pev şaşkirina peyvan bêderfet e.

Rez, reben (bax, jar)– R'ya sitûr jê re divê.

Xerz (baxê nû çandî)– "Ğ" jê re divê

Kûçik (se)– Tîpeke nû jê re divê.

Se, sed (Kûçik, hejmar)– Tîpeke nû jê re divê.

Ziman, zor (zor, kotek)– Tîpeke nû jê re divê.

Tû, tûj (dar, dijwar)– Tîpeke nû jê re divê.

Çem, çêle (robar, zarok)– Tîpeke nû jê re divê.

Teng, ta (nefireh, ben)– Tîpeke nû jê re divê.

Hemû, henek (giş, qerf)– Tîpeke nû jê re divê.

Pêr, par (Roja bertir, sala çûyî)– Tîpeke nû jê re divê.

Egir, enzêl (Ya ku avis nabe, holik)– Tîpeke nû jê re divê.

Ji bo her dengekî ji van bi tîpeke tesbîtkirî di mijara nivîsandinê de em bi xwe karê xwe pêk tînin. Eger daxwaz were kirin em ji aliyê xebatê ve re amade ne.

**FERHENGOK**

**Seraqet:** Bi dewamî
**Neşirkirin:** Weşandin
**Gemçkirin:** Hembêzkirin
**Nifş:** Nesîl
**Binyad:** Esil
**Nof:** Grub
**Gengeşe:** Kaos, buhran, tevlîhevî
**Meqeris:** Înatkar
**Sebûnet:** Ser xatirê
**Îstimal:** Bikaranîn

**NOFA ZIMANPERWER**

# Ji dendikê xoxê bawer bike, bi hêza xwe ewle bibe

Zarokê biçûk li xwe zor dide ku dendikên xoxê bi diranên xwe bişkêne.

Bavê wî jê re got:

"Lawê min!...Tu nikarî dendikê xoxê bi diranên xwe bişkênî!"

Zarok, bi diranên xwe dîsa zor da dendikê xoxê. Qalikê hişk ê dendikê xoxê yê girûzîn ku tekelê matoran tîne ber çavên mirov, rûyê diranên wî bivaşt û qirç kir...Destê xwe bir diranê xwe yê ku diêşiya zarok. Diranê wî dileqiya.

"Lawê min" dîsa got bavê wî: "Dendikê xoxê hişk e, diranên te heyf in."

Zarok inyad dikir. Ew dê her bişkanda, ev dendikê hişk. Wî ew danî erdê û bi paniya pêlava xwe pê li ser kir, dendik nedişkiya.

"Heke tu bi inyad bî, ez ji te bêhtir bi inyad im" got zarok.

Vê carê kevirek hilda; bi kêvir şikandin ceriband. Her ku wî lê dixist, dendik (hildipekiya) xil dibû aliyekî.

"Dendikê xoxê pir hişk e, lawê min" got bavê wî: "Tu nikarî wî bi wî kevirê biçûk bişkênî!"

Zarok bi hêrs pehîn li dendik da. Dendik çû li axa li ber avkêşê ket. Zarok, bi hêrs pê li wî kir, ew baş binerd kir.



Yılmaz Güney

Roj ji nav çûn. Zarok dendikê xoxê ji bîr kiribû. Bi zarokên taxa gecekondiyanre (guhê bajer) dileyîst. Bavê wî gazî wî kir.

"Ev çi ye, lawê min?" got.

Zarok, li aliyê ku bavê wî bi tiliyê xwe nîşan dida nihêrî. Wî giyayekî biçûk î bi du pelan dît.

"Giya" got.

"Ne giya ye" got bavê wî.

"Şitila dara wê xoxa ku te nikarî bi diranên xwe û bi kevir bişkanda ye."

Zarok, dendikê hişk î bi inyad anî bîra xwe. Wa ye, dendikê ku wî nikarîbû bi diranên xwe, bi kevir û bi pehînan bişkêne, xwe ve guhertibû şitilê. Ev şitil dê mezin bibe; gul vede... û xox bide, heyirî ma.

Bavê wî jê re got:

"Lawê min...kengî be, di kîjan şertan de be, gava ku tu bikevî tengasiyê, wî dendikê xoxê bîne bîra xwe. Te nikarî bi dîranê xwe, bi kevir wî dendikî bişkênî. Lê ew dendikê ku bikeve axa haweyî, ku roja wî bê, ew qalikê hişk perçe perçe dibe, axê qul dike û şîn dibe.

"Ew çi ye, vê hêzê dide wî dendikî, lawê min ê delal?

"Dendik, hêza xwe ya ku qalikê xwe parçe dike, ji nakokiya nava xwe distîne, lawê min. Her tişt di nava xwe de dijberê xwe dihewîne. Her tişt di nava xwe de, tiştê ku wê biguherîne dihewîne."

Zarok, bi baldarî li bavê xwe guhdarî dikir.

Bavê wî bi rûyekî geş got:

"Ji dendikê xoxê bawer bike
Bi hêza xwe ewle bibe...!"

**YILMAZ GÜNEY**
*WERGER: ŞEVGER RONAS*

# DEFTER

## Ziman û hunermendên bêziman

Der heqa girîngî û pêwistiya zimên de, Cegerxwîn di ristekê de, xweşî û şîrîniya zimanê me wisa tîne ziman:

"Vejêne zimanê xwe, ey xwendevan
Nebûye milet hîç kesek bêziman."

Seydayê Cegerxwîn di vê helbestê de xweşî û girîngiya zimanê makî bi hunera xwe ya zanyar û zelal tîne ziman, gelek nimûneyan ji Ehmedê Xanî û Meleyê Cizîrî diyar dike. Ew xurtiya zimanê kurdî tîne bîra gel.

Tu zimanê xwe ji bîr nekî
Eger baş nizanî divê zêdekî
Bibîne çi şîrîn e ev reng ziman
Çi payebilind û çi rûmet giran...

Civaknas û zimanzanan bêsebeb negotiye ku ziman nîvê kesbûna mirov e. Ji ber ku zimanek bi serê xwe kulturek e. Lê belê ji bo hînbûna zimanekî an jî tiştekî nola wî, girîng e mirov ji wî tiştî an zimanî hez bike, eger mirov ji tiştekî hez neke, bêşik nikare hînî wî bibe. Bi salan ev yek bala min dikişîne ku hunermend û dengbêjên me yên nû dest bi vî karî xwe kirine, gelek ji wan zimanê xwe yê makî baş nizanin, stran û folklora me dibêjin, lê orjînalîteya wê xerab dikin, ziman û stîlê kurdî jî bêmane berbat dikin. Bi awayekî din bêgotin, huner û çanda gel erzan û biçûk dikin. Da ku şaş neyê fêmkirin, ez ji bo hemû kesan nabêjim, lê belê ên ku bi tirkî bifikirin û bi kurdî bibêjin, ên ku bi salan dibêjin û hê jî tîpa "w û v" ji hev dernexînin, gotina "lo" li şûna "lê" bibêjin û ya "lê" li şûna "lo" bibêjin, êdî girîng e mirov ji van kesan bipirse, "bi wijdan û rastiya we be, hûn ji zimanê kurdî hez dikin an na?.." Hûn dizanin ez ji bo çi pirseke wisa pêwist dibînim? Ji ber ku min ên ku ji zimanê xwe yê dayik hez nakin û bi kurdî jî stranan dibêjin, bi xwe dîtine. Dengbêjeke jin, çend kasetên xwe jî çêkirine, rojekê min jê pirs kir: "Tevî ku dengê te xweş e, lê belê gava ku tu stran û folklora me dibêjî, bi sedema ku zimanê te yê zikmakî zeîf e, tu van nirxên me yên gelî dipelçiqînî, tu mane di stranê de namîne û şêweyê ku pê tê gotin baweriyê nade mirov ku kurdî ye, her tişt mîna tirkî ye... çima gelo?" Hûn dizanin, vê dengbêjê bersivekî gelekî durist da min: "Ez ji zimanê kurdî hez nakim, mîna zimanê 'tirkî' kêfa min ji zimanê kurdî re nayê, ji bo vê yekê, gava ku dibêjim, tim dixwazim mîna tirkî telafûz bikim..." Îro li holê gelekan xwe hunermend îlan kirin, lê belê zimanê xwe jî li pişt xwe ji bîr kirine, gava tê bîra wan jî, mêze dikin ku zimanekî "ne şîrîn e–kêfa xwe pê nayê" an jî mîna "tirkî" wan têr nake!

Lê belê kesên wisa, bi rastî wan, xwe bi xwe ji bîr kirine, ku gava mirovê xwe hunermend bibîne, berî her tiştî, hunera gel bi zimanê gel tê çêkirin! Lê yên me mibarekan, ne bi tirkî baş dikarin mîna tirkan biaxivin, ne jî, ji zimanê xwe hez dikin, da ku xwe baş hîn bikin û bi kurdiya rast û durist mîna zimanê gel bibêjin.

**XELÎL XEMGÎN**

www.arsivakurd.org

BI NAVÊ YEKÎTIYA ÊZIDIYÊN KURDISTANÊ

# Em jî bi serbilindî dimeşin Parlamentoya Kurdistanê

**Dema dewleta osmanî ji derve derbe dixwarin, ji sala 1835'an heya sala 1845'an di bin rêberiya generalê alman Helmut Von Moltke de, yekcar kurdên êzidî yên hê jî li ser riya xwe mayî, ji Meletyê heya Rewandûzê di bin qirkirinên mezin de derbas kirin.**

Li gorî dîrokvanên cîhanê û li gorî bingeha civaka me mîna çand, erf û edetên me hebûna gelê me li dora 5 hezar sal e ku di navenda Rojhilata Navîn de li ser axa welatê me heye. Ji dîroka ku tê naskirin û bi vir ve êzidiyan xwe bi navê êzdayî dane naskirin. Berî 2625 salan Zerdeşt pêxember ev bîr û bawerî ava kiriye û wekî Zendawesta bi nav kiriye. Bi vê bîr û baweriyê xwe bi jiyana gel ve li gorî şertên wê demê daye girêdan. Êl û eşîran ji bo menfetê gel bi hev dane girêdan û civaka gelê me ji bo parastina hebûna me li hemberî zilm û zordariyê saz kiriye. Cara yekemîn e ku li hemberî êrîşbazên derveyî li ser riya êzdayî bi rêberiya Zerdeşt bi destê Kawayê Hesinkar Yekîtiya êl û eşîran ên mîna cindiyan, horiyan, mîtaniyan û gelek êlên din, çêbûye. Di jiyan û bîr û baweriya me de navê Xweda, Ezda û Meda sê navên bingehîn in. Xweda, mirov û cîhan, erd û ezman afirandiye. Ezda Xweda nas kiriye û ji xwe re Xweda Ezda qebûl kirine. Di dîrokê de civaka Ezdayî ji bo parastina cih û warê xwe û ola Tawisî Melek, hikim û qedera xwe xistine destê xwe û navê vî cîh û warê pîroz danîne navê Meda.



### Destpêka zilm û zorê

Di salên 640'an de, dînê îslamê derket. Di destpêkê de û di rastiya xwe de azadiya gelan dixwest û li hemberî koledariyê şer dikir. Piştî salên 700 êdî di bin navê îslamiyetê de Ebasî û Emewiyan dest bi talankirin û wêrankirina cih û warê me kirin. Di vê demê de cara yekemîn e ku bi zora şûrê ereban, di nava gelê me de parçebûn çêbû û ji wê demê ve rojên tarî û reş li ser me hatin danîn. Van rojên tarî 400 salî heya sala 11000 berdevam kir. Ne tenê qetlîam li ser me pêk anîn, piranî erîşî bîr û bawerî, çand, huner û zimanê me kirin. Xwestin hebûna me ji ser rûyê erdê hilînin. Lê li dijî van êrîşan herdem berxwedan û serhildanên mezin hatin pêkanîn. Di bin van şertên giran, zor û teng de xwedanê me mîna Şêx Adî, Şêx Şems û xwedanê me yên din, li xîret û îmanê xwedî derketin û ji bo parastina welatê xwe tevgerek nû li dar xistin. Di wê demê de Sed û Hed xistin nava miletê kurd ji bo ku karibin li hemberî êrîşên zordarî û çandî xwe biparêzin. Di qewlê me de wiha tê gotin: "Şîxadî, Şêxalê Şemsa xweste dîwana xwedê, berê xwe dide Ezîdxanê, li ser me dibe ferza îmanê, ew e îda Kurdistanê". Bi vê tevgerê bingeha kurd û Kurdistanê tê avêtin.

Mixabin êrîş êdî ne tenê ji aliyê ereban ve hatin ser me, piştî salên 1200 êrîşên gelek zordar ji aliyên osmaniyan ve jî li ser me bariyan. Ji bo parastina mafên xwe yên şexsî eşîrên xayîn bi destê dijmin girtin û li hemberî esil û esasên xwe, di warekî înkarî de sekinîn.



Li Laleşê li ser dîwar û serderên avahiyeke pîroz, hin motîfên ola Zerdeşt tên dîtin.

### Li hemberî zilmê serhildan

Lê gelê me qet bindestî û koletî ji xwe re qebûl nekir, xwe kişand çiyayê asê û berxwedana xwe berdewam kir. Herwiha di dîrokê de 72 fermanên mezin ji hêla osmaniyan ve bi serê me de hatine. Serhildana Şêx Mîrza li Xerzan nimûneyek ji van e. Dema dewleta osmanî ji derve derbe dixwarin, ji sala 1835'an heya sala 1845'an di bin rêberiya generalê alman Helmut Von Moltke de, yekcar kurdên êzidî yên hê jî li ser riya xwe mayî, ji Meletyê heya Rewandûzê di bin qirkirinên mezin de derbas kirin. Li aliyê din ereban jî bi destê îngilîz û fransizan qetliama li çiyayê Şengalê pêk anîn û serhildanên di bin rêberiya Dawidê Dêwin de fetisandin. Emperyalîstan di vê demê de ji bo yekîtiya gelê kurd çenebe, dijmin pêşî bi navê dînî li dijî kurdên êzdî şer kirin. Dû vê re berê xwe dane kurdên misilman jî. Li ser rêca vê siyasetê gelek serokên me mîna Şêx Mîrzayê kurdên êzdî, Şêx Seîdê kurdên misilman û Seyîd Rizayê kurdê alewî bi darê kindîrê ve li Amedê li pey şopa hev hatin daleqandin.

Piştî çarparçekirina Kurdistanê jî ev siyaset li dijî êzidiyan carinan veşartî, carinan jî eşkere ji terefê dewletên kedxwar û destikên wan mîna olperestê xayîn axa û began hatiye meşandin. Di dema de nû de her çiqas li Kurdistana Başûr bi navê Kurdistanê xebat hatibe çêkirin jî, dîsa mafê êzidiyan nehatiye parastin.

Di dema salên 70'î de, wexta tevgera neteweî dest pê kir. Êzidiyan jî di dema pêş de yek bi yek herikîn Ewrûpayê. Bi derketina şoreşa serxwebûn û azadiya Kurdistanê, hêdî hêdî êzidî di nava gelê xwe de bûn xwediyê qedir, rûmet û qîmetê. Nimûnêyên wê li Mêrdînê, li Êlihê û Wêranşarê hatine dîtin.

### Êzidî kulîlkên keskbûna bihara me ne

Serokê neteweyî bi xwe wiha dibêje: "Ezidî kulîlkê keskbûna bihara me ne." Ev gotina girîng hêvî û baweriyên mezin di kûrbûna dilê me de çêdikin ku di demeke kurt de, berî em di vê jiyana gemarî de winda bibin em dîsa vegerîn ser erdê bav û kalên xwe.

Sazkirina Parlamentoya Kurdistanê ya li Sirgûnê ji me re yek hêviyê ku piştî ewqas qetlîam, zilm û zordarî, berxwedan û serhildanê leheng em di nava gemara dîrokê de winda nebin, em di dema pêş de bi gelê xwe re rûpelên dîrokê yên nû û paqij vekin û di dîrokê de cihekî bi şeref bigirin.

Em nûnerê Parlementoya Kurdistanê ya li Sirgûne silav li serokatiya neteweyî, li artêş û gelê xwe dikin û ji bo azadiya gelê xwe li hundir û derveyî welatê xwe amade ne.

**Hasan Dutar**
**Dewrês Haaso**
**Ali Sacik**




1970–15.41993

**Nazmi Uçar**
**(Dr. Ronî)**

Stêrk dixuricin, stêrk
Ji esmanên welêt
Gotina pêşiyan e,
Xuricîna stêrkan hatin e
An jî çûyîna mirovên pak in
Ji rûkê xaka sar
Erê dayê, erê
Li Misêwa stêrk dixuricin lê
Misêwa û misêwatir
Dayik dixuricînin stêrkan

**Li ser navê malbata wî Aynur**



**Mahmut Döken**

Tu dostê mêr û dostan bûyî
Hevalbend û pakrewan bûyî
Tu kelemê çavê neyaran bûyî
Armanca te jîr û zan bû
Hesreta te Kurdistan bû

Bavê me, birayê me û hevalê me Mahmut Döken, 4.4.1994'an de wefat kiribû. Di salvegera mirina wî ya yekemîn de, em wî bi rêzayî bi bîra xwe tînin.

**Li ser navê malbata wî Sîdar Döken**

www.arsivakurd.org

# FORREST GUMP

(Dimilî)

Fîlm wextoki destpêkena, yew parçey per î-per ê mîçikivay vera hewadi weyra ra weyra tadiyeno vindeno. Va, kamik kişti ra danopirose per zî ay kişt sera şono...Peynîdê şano nigî da Forrest Gumpî ra nişeno.... Yonî yew kiştra sey Forrest Gump î...

Forrest Gump, Wextokî 6–7 sere yo, may jey (pî jey çînyo), Forrest î benaki qeydê mektebî biko. Labelê mekteb dê may ra vanê: "Aqilê Forrest î kemiyo, ma niştê jey qeyd bikê." Eyla may sekena kena... lajê xwi qeyd kena. Ow sebeno se inkagyra pey beno, şanse (bext) Forrest î abeno....

Forrest Gump, sey ay perr dê mîçikî va (qeder) jey beno kora, kam kişta ser se şono weyra... Eyla çi hikmeto se va, zafin hetê Forrest î yo...

Mesela niga jey weş bena... Mesela lejdê Vietnamî ra o tena sax sahim xelêsyeno... Mesela beyntar deryayî dê yew firtiney do pîlîra gemî ya jey tena xelêsyena... Va, jey beno J.F.Kenedy, Johason î, Lenon î reyda sinasnayiş dano...

Kê hindasî talihî verdê xwî şaşkenê... Eyla ray ray bêtalihey (bêbextey) zî giraney jey veranêdana.....

Peynî: îna fîlm veynê... Mi gorê şima ina fîlm dê, tikê "çiyer Dê Aşm da Tirmehî Di Biyo," tikê " Platoon" î, tikê zî "Rain Man" (Merdimê Dijnê) î veynenê...




Forrest Gump, yew dimandê fîlm do

**Namey fîlm:** Forrest Gump
**Sermiyan:** Robat Zemeckis
**Muzîk:** Joel Sill
**Kaykerdoxî:** Tom Hanks, Robin Wright, Mykelti Williasson, Saly Field
**Kaşkerdox:** Don Burgess
**Nuştox:** Eric Roth
**Kitab:** Wiston Groom
**Welat:** USA/ 1994

Dismala xwi, xwi vîrî mekê!...

**Oskar ê fîlm da Forrest Gump î**
**Fîlma En baş:** Forrest Gump
**Sermiyan o En Baş:** Robert Zemeckis
**Kaykerdoxo En Baş:** Tom Hanks
**Nuştoxo En baş:** Eric Roht
**En Baş Adaptasyon:** Arthur Schmidt
**En Baş efekt:** Ken Raloson, George Murphg, Stephen Rosembaum, Allen Hall.

CEMAL PÎRANIJ

# AZADÎ

## Golikê Pixço



ABDURRAHMAN DURRE

Mirovekî bi navê Pixço hebûye, ji çêleka wî re golikek dibe. Pir pê şad dibe, jê re afirekî pir xweşik çêdike, lê dibe xweyî, giya û av û cehê wî bi destê xwe dixe ber. Pê re meşxûl dibe, heta ku golikê wî dibe conega. Lê mixabin, devê wî nagihîje afirê wî yê goliktiyê. Roj bi roj biçûk dibe, sal bi sal bi paş ve diçe, di nav gel de dibe pêkenîn û sembola paşveçûyînê. Gel dibêje: "Bûye golikê Pixço, sal bi sal bi paş ve diçe." Jixwe peyva pixço di kurmancî de bi wateya paşveçûyî, tewş û mewşa tê bikaranîn. Bi rastî mirov ji gedê paşê (Erdal İnönü) re jî bibêje: "Golikê Pixço" pir cihê xwe digire.

Golikê Pixço gedê paşê dema ku golik bû di afirên bilind de dijiya yanê afirê wî bilind bû. Dema ku bû conega, afirê wî niviz bû, di dawiyê de bû ga û afirê wî niviztir bû. Gelo ku niha gayê mezin bavê wî sax bûya wê ji golikê xwe yê pixço re çi bigota? Ez wê nizanim, lê belê ez vê yekê pir rind dizanim ku gotinên pêşiyan pir manedar in.

Ez dixwazim vê nivîsa xwe bi çend gotinên pêşiyan û şîrovekirina wan biqedînim:

"Hezar bavên çê, esil şîrê dê.", "Xwarzî li xalan, kurîk li falan.", "Mirovên kin qeşmer in, ên dirêj jî ker in", "Ji dêla tirek, seyên gurêx nakevin", "Berxê çê li ber kozê kifş e", "Zarên molan mol dibin, çend salan çê dibin, paşê wekî bavê xwe lê dibin."

Di binê ronahiya van gotinan de ku mirov li gedê paşê mêze dike û difikire, ev tê hişê mirov: "Gelo şîrê wî neçê bûye yan bavê wî he tu tişt bûye yan ...?"

Lê ku mirov kûr û dûr bifikire û li ser bisekine, dibîne ku tam lawê bavê xwe ye. Bavê wî bi peymana Lozanê Kurdistan parçe kir û kurd xapandin. Ew jî îro dixwaze Kurdistanê berbat bike û kurdan bixapîne. Lê belê heyhat û heyhat, ew rovîtî û sextekariya ku bavê wî kir, ew nikare bike. Lewre ne law wekî bavê xwe dibe, ne jî kurd kurdên wê demê ne. Gerçî çaşik û xayînên dema bavê wî yê zehmetî îro jî hene û daw û dêlên xwe hildana, wekî banciyên zexel, dane dû dêlegurekê, lê gelê kurd êdî bi wan jî naxape. Doza kurd û Kurdistanê ketiye rojeva cîhanê, ji destê caşik û xayînan êdî tu tişt nayê. Bi tenê ew maye ku binê dêla dêlikan bêhn bikin wekî boxeçûran. Li pey bimeşin û bibin pêkenok û teresên dîrokê...

Golikê Pixço bû conge,
Guro hirço punge punge
Zeyneba Zer terî hilda
Hikoyê Ker li dû qil da
Ga û golik ker û caşik
Bûne polik tirkên faşik

# Zimanê navneteweyî sembolîk e

Dîroka Kurdistanê jî wekî Kurdistanê, pir a rêwiyan e. Her wiha çanda kurdan jî çandeke bingehîn, cihêreng, dorfireh û dewlemend e. Mixabin heta niha bi hezaran çîrok, mîtos, metelok, stran winda bûne, di tariyê de mane; ku ji vir pê ve ev kevirên çandê werine berhevkirin wê xelxeleke mezin kom bibe.

Mabesta min ew e ku ez hinekî li ser xewnan rawestim. Di jiyana civakî de şîrovekirina xewnan guneh tê hesibandin û pejirandin. Ev bawerî ji ola îslamê ketiye nava çanda kurdan. Em dibînin ku hinek zanyar qasî çîrok û mîtosan nirxê didine xewnan. Ji yek wan jî "Erich Fromm"e.

Erich Fromm, di pirtûka xwe ya ji weşanên Arıtanê, li ser navê "xewan, çîrok, mîtos" derketiye, van ramanan pêşkêşî xwendevanan dike: "Mirovahiyê tenê zimanekî navneteweyî pêk aniye, ew jî zimanê sembolik e, ji çandên di hundirê herikandina dîrokê pêk hatiye, ji bo tevan wekhev e.... Sembol sê cûre ne: toreyî, tesadûfî û navneteweyî.... Wekî xewnan mîtos jî di hundirê dem û war de xwedî pêkhatineke dîrokî ne...."

Belê Erîch Fromm qasî çîrokan û mîtosan nirxê dide xewnan, Formm dibêje: "Divê xewn bên şîrovekirin," ji sedemeke şîrovekirinê jî dide xuyandin: "Di hîmê hebûna me ya zanalî de tevger û têkoşîna mayîna me ya li jiyanê vedizele."

Xewn wekî her civakê di civaka kurdan de jî cihekî girîng digire, hela hela di van salên cengî de.....

Di jiyana kurdan de, pir sembolên toreyî hene. ji wan hemek ev in.

av – ronahî
hesp – miraz
gogerçîn – mêvan
kuştina mar – çare
dilan –mirin
kanî – dewlemendî
ga– şol
girîvandin – ken
leşker – şehîd

Wer bûna ji zinaran – xelasbûna ji gunehan tên şîrovekirin û pejirandin.

Nîşe: Erîch Fromm lêkolînêrekî alman e. Xebatên wî yên zanyarî bi tirkî de hatine weşandin wekî: "Hunermendiya hezkirine", "Kesayetî" û hwd.

JÊHAT GIMGIM



www.arsivakurdi.org

## Delaliyên min! Merheba

Hevalên şîrîn û delal! Hûn çawan in, baş in? Hêvî dikim ku hûn her tim bi kêf û sihet û baş bin. Ji zû ve ye me hevûdu nepirsîbû. Lê ji ber vê, ez pir xemgîn bûm. Çimkî ji ber hinek sebeban min nenivisand û min li we nepirsî. Lê gerek dikir ku hûn bipirsiyana. Bi resim, şiîr û çîrokan we rûpelên xwe bixemilandana. Dibe ku sebebên we jî hebin, lê divê ji îro pê ve hûn zêdetir bala xwe bidin rûpela xwe û berhemên xwe ji min re bişînin û ezê jî di rûpela we de biweşînin.

Berî çend hefte hin hevalên şîrîn ji min re resim şandibûn û me jî weşandibû. Ji we daxwaz dikim ku hûn zêdetir bişînin. Ev hefte ez nivîseke xweşik ji bo we didim. Hêvî dikim ku zehf kêfa we were. Bimînin di xweşiyê de.

**MAMOSTE ZOZAN**

# Sê xwişk an sê çiya

Gelî zarokan, werin em çîrokekê hîn bibin. Çîroka çiyayên Keber, Kurîs û Sîser. Ev her sê çiya navê xwe ji wan sê xwîşkan standine. Ev çiya li navbera bajarên Sêrt û Bilîsê dikevin. Herî bilindê wan Sîser e. Nêzikî du hezar metreyî bilind e. Sîser çiyayekî wisa asê ye ku tu car rê nade ku mirov hilkişe navsera wî. Bi zinar û kevirên tûj e. Ji ber vê yekê xelkê dora Xerzan jê re wiha dibêjin: "Ev çiya ewqas bilind e ku tu car sî lê danayne û serî tim bisî ye."

Navê Sîrser jî, ji vê rewşê tê, sî nayê ser, an jî sî nare (nehere) ser. Pişta Sîser hemû dar in, darên fêkiyan, wekî gûz, sêv, hermî, alûç, tirî, guvîş.

Çiyayê Keber jî dema mirov ji dûr ve lê dinihêre, serê wî mîna şeklê serê mirovan e. Bilindbûna wî jî bi qasî hezar û heşt sed metreyî ye. Li ser vî çiyayî zozanên pir mezin hene. Avên zozanan jî pir sar û xweş in. Keber Geliyê Şêx Cûma hembêz dike û zinarên wî mîna kemberan mirovan radipeçe.

Kurîs bi qasî Keber bilind e. Li dora vî çiyayî jî daristaneke mezin û gur heye. Mirov bi roj jî, bi tenê newêre bikeve nava vê daristanê. Ji bilî şoreşgerên azadiyê tu kes dernekeve serê Sîser û Kurîs.

Di nava gel de çîroka Sîser, Keber û Kurîs bi vî awayî tê vegotin. Di demeke pir kevin de dijminan erîş anîne ser Kurdistanê, her dever talan kirine û şewitandine. Ji aliyê rojhilat ve hatine û xwestine ber bi rojava ve herin û hemû welêt vegirin îşgal bikin. Birek ji leşkerên neyar xwestine ku di Geliyê Şêx Cuma re derbas bibin û bigihîjin deşta Amedê.

Wê çaxê mîrek (mîrnîşîn) hebûne, her yekî ji wan di herêma xwe de hûkumdarî dikirin. Fermandarê Bilîsê tevî leşkerên xwe ve li ser çiyayên Sîser, Keber û Kurîs rê li ber leşkerên neyar digirin. Di navbera wan de şerekî giran derdikeve û şer sê rojan dewam dike. Neyar nikare di nava leşkerên kurd re bibihûre, bi şûn ve dizivîre. Di domiya şer de gelek leşkerên neyaran tênê kuştin. Di vî şerî de sê xwişk li ser çiyayên Sîser, Keber û Kurîs şehît dikevin. Mezelê her sê xwîşkan îro li ser serê wan çiyan e û bûye ziyaretgeha xelkê derdorê.

Li herêma Xerzan dema xelk dikevin nava tengasiyekê diçin ser van ziyaretan û ji wan alîkareyê dixwazin. Heta baweriyeke wisa ji wan re çêbûye ku gerîlayên azadiyê bûne hevalên van şehîdan. Lewre leşkerên Roma Reş nikarin bi gerîlayan û nikarin bikevine Geliyê Şêx Cûma.

Belê wan çiyan gelek şerên giran û xedar dîtine. Lê ez bawer im ku tu caran wekî vî şerê romê rastî zilm û xedarê nebûne. Gundên li pişta çiyayên Sîser, Keber û Kurîs ji aliyê leşkeran ve hatine şewitandin. Di wan gundan de bi sedan zarok jî hebûn. Kî dizane ji bav û diyên xwe, ji dapîr û bapîren xwe çend caran çîroka van çiyayan guhdarî kiribûn.

**ROTÎNDA YETKÎNER**

# NAMEYÊN XWENDEVANAN

## Têkoşîna rizgariya zimên

Hevalên hêja! Em bi zimanê xwe dixwînin û dihewisînin. Lê ev tenê ne bes e. Pêwist e em zimanê xwe bidin xwedin ku ew jî pêş ve here û wekî zimanê dîn bêkêmasî were axaftin. Ji bo ku em vî karî pêk bînin, pêwist e em xebatên girîng bikin; pirtûk, kovar û rojnameyên der heqê zimanê xwe de (pêşî Welatê Me) peyde bikin, bixwînin û bidin xwendin. Li ser wan nirxandinan bikin û der heqê zimanê xwe de bi hevkarî em bixebitin. Çawa em îro têkoşîna rizgariyê didin, pêwist e em têkoşîna rizgariya zimanê xwe jî pê re bidin.

Daxwaza min ji berpirsiyarên Welatê Me ev e; Ji bona kesên ku nû bi kurdî dixwînin rûpeleke dersên kurdî (rastnivîs, rêziman...) biweşînin. Lewre ew rûpel wê cihê dibistaneke biçûk bigire. Daxwazeke min a din jî li ser îlandana pirtûkên di derheqê kurdan û kurdî de ye. Nivîsên wisa wê ji me re bibin sersebep ji bo ku em pirtûkên kurdî bistînin.

**Serwext / Êlih**

## Weşana TV–MED'ê dilê me geş kir

Silava Xwedê li ser we be gelî hevalan! Di hemû xebat û çalakiyên we de ji we re serfirazî û pêşketinê dixwazim. Di karê we yê pîroz de pêşketina we ya gelê me ye. Barê ku li ser milê we ye yê me hemûyan e. Lê we xebatkarên Welatê Me ew hildanye ser milên xwe û hûn bi rê ve dibin. Hûn wezifeya me tevan pêk tînin.

Van rojan nûçeyek hat guhê me û em gelek pê kêfxweş bûn. Ev xeber destpêkirina weşana TV–MED'ê bû. Ev gava mezin çiqas dilê neyar û xwefiroşan reş kiribe, ewqas jî (hîn zêdetir) em bi wê rûgeş û dilgerm bûn. Kesên karê wan di vê xebatê de heye ji tevan re serfiraziyê dixwazim.

Bimînin di xweşiyê de. Serkeftin ne dûr e...!

**M.Nezir Oğuz / Dihê**

## Bila me aciz nekin!

Silavên bi xwestina rihetiyê û bi hesreta azadiyê li ser we û hemû gelê kurd be.

Di wexta rojnameya Welat de Apê Musa di nivîseke xwe de wiha digot: "Xortno, tirk alfabaya xwe di deh salan de hîn bûn. de bavê minno gereke hûn di deh rojan de hîn bibin." Ji wê çaxê ve ez hîn bûme, dinivîsim û dixwînim. Em hemû minetarên Welat û Welatê Me ne. Rojnemeya Ö. Ülkeyê jî girtin. Ew dewleta xedar bila bêminet be. Pir zorê bidine me emê navê rojnameyê bikin Kurdistan. Pêlên behreke kûr bangî me dike. Ji bona ku em xwe bavêjin avê gerek e em avjeniyê bizanibin. Qirêjiya şerê li holê em hînî lazim bûna avjeniyê kirin û em elimandin avjeniyê.

Dizanim ku îro rojnameya Welatê Me dengê me ye. Kêmasî û çewtiyên wê yên me ne. Lewre ji me dertê. Va ye bihara îsal jî hat. Rojê daye ser welat. Ne kêf maye û ne jî xweşî, riya ku diçe azadiyê kin bûye. Gerek e em destê xwe bidin hev û dev ji pereyê hûr û keçê xerab berdin. Ne roja evîndariyê ye, bawer bikin dema azadî tunebe hezkirin jî bêfeyde ye. Ji bo wê yekê bang li xort û ciwanan dikim:

-Rojeke giran li pêşiya me ye. Îro li Ewrûpayê Yekîtiya Ciwanên Kurdistanê (YCK). heye û Yekîtiya Xwendevanên Kurdistan ê heye (YXK). Me ji xort û xwendevanan bi van re têkilî danîbûna, îro halê me wê wekî din bûya. Lê em hîn jî nederengmayî ne. Ka rabin çavên xwe vekin.

**Rêzan Heval / Qoserê**

## Bersiva leglegê

Roja 20'ê adarê dugela daginker daxuyaniyekê ji saziyên xwe yê fermî re şand. Di wê nivîsê de li ser cejna Newrozê rawestiyabû. Di nivîsê de ev ramanên biriqî, ramanên zanyarî, dîtinên nû hatine pêşkêşkirin: "Tirk çarsed salî di Ergenekonê de mane. Talî gur rê rava wan kiriye, tirk bi saya gur xelas bûne... Newroz îda tirkan e.. Îda biharê ye... Wekî tê zanîn hêzên parçekirinê jî xwedî lê derdikevin..."

Xortek ji apê Elî dipirse: "Apo, hevalên te tev mirine, tu çima namirî?" Apê Elî wiha dibersivîne: "Lawê min yê nebaş zû zû namirin." Belê ji bûyina mirov heta îro tu carî nebaşî qut nebûye. Mixabin ji nebaşiyê para pir bûye ya kurdan. Lê ev gotara kurdan ji dermanê pir birînan e: "Heta mirov bi bêvila kerê negire ker nasekine." Bi rastî endamên saziyan jî tevan bi nivîsêkenên xwe kirin. Werin em hinek alîkarî ji ramanên wan yê nijadperest re bikin. Tirko biricife were ser xwe, tu carî nexape, kurd ji fezayê ne! Bi boçik in! Bi hezaran salan li Mezopotamyayê ji mirovahiyê re berdestî kirine! Ne wekî me bûn! Me xwîn rijand, Ewrûpa di bin şûrê xwe we derbas kir ûhwd.! Çavên xwe vekin tirkino! Geliya Zîlan, Dêrsim, Helebçe, Licê, Cizîra Botan... şaxên rastî û mirovatiya me ne..

Bi bawer im ku ev pêkenok serî li her tiştê digire. Carekê du legleg di hêlînê de diaxivin. Yek ji ya din re dibêje: "Me hêlîn tijî zîrç kiriye. Nema em dikarin tê de bisekinin. We re em hêlînê biguherînin." Leglega din dibersivîne: "Em herin ku derê jî qûna me bi me ve ye."

**Cîhan Roj**

www.arsivakurd.org

"Ji bo neteweyekê malkambaxiya herî mezin ew e ku dîroka wê bi destê kesên din bête nivîsandin." Ev gotin ya Dîrokzanê Îngilîz Arnold Toynbee ye. Pêwist e ku em li ser vê gotinê baş bifikirin û dersên girîng jê derînin. Rastbûna vê gotinê di pêvajoya dîroka gelan de bi mînakên berbiçav hatiye îspatkirin.

Gelên bindest ên ku dîroka wan ji aliyê kesên din ve hatiye nivîsandin, piştî rizgariyê jî bi ser xwe ve nehatine. Esas ne tenê nivîsandina dîrokê, her wiha, çêkirina wê jî eger bi destên kesên din be malkambaxî ye.

Yên ku dîroka xwe nenivîsin û çênekin an wê winda bibin an jî wê kesên din li gorî xwe rastiya wan berevajî bikin. Çêkirina dîrokê çi ye? Têkoşîn e û bi riya têkoşînê jî avakirina saziyên neteweyî ye. Ji dibistanan bigirin ta artêşa neteweyî, ji radyo, televizyon û rojnameyan bigirin ta

## JI WELATÊ ME



MAZHAR GÜNBAT

## Kurd dîroka xwe bi destên xwe çêdikin

parlementoyê hemû sazî û avahiyên neteweyî; eger ne bi destê xwediyên xwe bên avakirin bêkêr in, ne serbixwe ne û zehftir bi îradeya kesên din dimeşin.

Îro hê jî pir netewe hene ku bûne xwedî dewlet, lê ji ber ku bi destê dijminên wan saziyên wan hatine avakirin ew negihane rizgariyeke tekûz. Ji wî aliyî ve kurd xwedî cihekî taybet in. Ne kurdan heta îro bi temamî dîroka xwe çêkirine, ne jî dagirkeran li gorî xwe ew kirine xwedî saziyên neteweyî. Çi serhildan û têkoşînên gelê kurd yên ji bo xwedîderketina li dîroka xwe çêbûbin tev bi darê zorê, bi qetlîaman û carinan jî bi xapandinê hatine sekinandin. Dewletên ku Kurdistan îşxal kirine, bi taybetî jî dewleta tirk, ji avakirina komara xwe û bi vir ve hemû polîtîkayên xwe li ser înkarê ava kirine. Avakirina saziyên kurdan li aliyekî, vê dewleta nijadperest hebûna kurdan jî înkar kiriye.

Ji bo kurdan ew pêvajo qediya ye. Ji roja ku têkoşîna rizgariya gelê kurd bi çekdarî û bi rêxistinî pêşî li Bakur dest pê kiriye, heta niha gelek tişt guherîne. Ji hingê ve kurd gav bi gav saziyên xwe yên neteweyî çêdikin û zêde guh nadin pêşniyazên dewletê. Ev dewleta ku heta berî çend salan her tiştê vî gelî, heta hebûna wî înkar dikir; îro behsa dersên kurdî, dibistan û televizyonên kurdî filan bivan dike. Lê êdî ji bo dewletên dagirker pir dereng e. Carekê kurd şiyar bûn û haya wan ji saziyên wan heye. Êdî kurd televizyon û radyoya xwe bi destê xwe ava dikin, enstîtu û rojnameyên xwe bi destê xwe diafirînin û dimeşînin. Hejmara van saziyan jî her diçe zêde dibe. Êdî parlemento jî (li derve be jî) ava bû û ji bo kurdan bû hêviyeke pir mezin. Kurd saziyên xwe bi destê xwe ava dikin. Kesên din bixwazin jî piştî vê saetê kurd, dîroka xwe bi kesên din ne didin nivîsandin ne jî didin çêkirin. Ewê bi destê xwe welatê xwe ava bikin.

# Parlemento û oldarî

Xebatên Parlementoya Kurdistanê bi pir dengî û pirrengiyekê didome. Di damezirandina vê parlementoyê de wekî Hereketa Îslamiya Kurdistanê, Yekîtiya Alewiyên Kurdistanê, Yekîtiya Êzidiyan jî ji bo derbirîna (îfadekirin) xwe cih girtine û delegeyên xwe hilbijartine. Bi hezar salan vir ve êzidî jî, suryanî jî, alewî jî bi hev û din re li ser vê axê jiyan e û tev xwediyê vî welatî ne.

Di dîrokê de gelek lîstik li ser vê yekê hatine lîstin. Qetlîama ermenan wexta ku li dar xistin misilmanên kurd çawa ku bi awayekî ne xweş cih girtine, îro jî dewletê kurdnebûna alewiyan avêtine holê. Kurdbûn ne navê olekî û ne navê mezhebekê ye, kurd navê neteweyekê ye. Di bin vê dara mezin de cur bi cur ol, mezheb karin cih bigirin. Daxwaza me ev e ku ev sazî û rêxistin vê lîstika dewletê ku dixwaze pêk bîne rastiya wê ji gel re eşkere bike û gel ji van daxwazên xerab agahdar bike.

Mafê tu kesî tune ye ku têkeve navbera mirovan û Yezdanê wan. Bîr û bawerî, tiştekî cihêreng e. Belê çawa ku doh ol xistin bin xizmeta dewletê û ji bo daxwaziyê xwe ya xerab, ew oldar xapandine, îro jî dixwazin wan kesan bixapînin.

Ji aliyekî ve Serokkomar Demirel di rojiyê de xwarin ji bo fitarê didan û berî fitarê Quran dida xwendin. Serokwezîr Tansu her wext peyva "dengê azanê û Quranê" ji devê xwe kêm nake. Lê tobe ku carekê tenê nimêj kiribe an rojî girtibe. Ez bixwe ne bawer im. Durûyê mezin Erbakan siyaseta partiya xwe bi temamî bi ola îslamê ve girêdayî dide nîşan. Lê hê jî diravên ku ji bo Bosna dane hev, çi kirine ne xuya ye. Heta doh alewîtî tiştekî ne baş didît, lê îro hembêza xwe ji wan re vekiriye. Çi hîkmet e? Wekî ku kesek bi rûye wan î rastî nizane wexta hilbijartinan ji bo ku alîkariya kurdan bi dest bixin tu cambazî namîne ku nakin.

Di 12'yê rezbera (îlon) 1980'yî de wexta cunta faşîst hat ser kar serokê cuntayê Evren ji bo ku alîkariya gel bistîne di axaftinê xwe de tim ji Quranê ayet an jî hadîs (peyvên pêxember) dixwendin. Ji aliyê din ve jî bi hemû hêza xwe xortên ciwan, keç û jin, pîr û kal heta bi zarokan di îşkenceyê re derbas dikirin û xwîn dirijand. Ji bo ku mirovêan nezan bêjin: "Binêre va ye ji ola me hez dike." Bi vî awayî gemarî û qirêjiyên xwe didida veşartin. Gelo Evren çiqas misilman bû?

Di wexteke wekî îro de ku şerê azadiyê gihîştiye cihekî pir girîng, yekî kurd anîne serê Serokiya Karê Oldariyê (Diyanet İşleri Başkanlığı). Eceb yekî tirk qasî vî kesî misilman peyde nekiribûn. Ev kes di şev û rojên ku ji bo misilmanan pîroz in de derdikeve televizyonê diaxife da ku tevgera azadiyê li dijî ola îslamê bide naskirin.

Ev rêxistinê ku bi vî rengî di parlementoyê de (PKS) cih girtine di pêşerojê de ji bo valaderxistina vê armanca dewletê wê rolekî girîng bigirin ser milê xwe. Li aliyê din jî tê xuyakirin ku tevgera azadiyê ne tevgereke di bin bandora tu eşîr ol û mezheban de ye. Lê belê ne li dijî van olan e jî.

MAMOSTE
BEDRAN BÊNAV

## FERHENGOK

- **Afir:** Cihê êm (sığınak)
- **Dugel:** Dewlet
- **Firaqşo:** Kesê ku firaqan dişo
- **Gede:** Zarî, kur
- **Gerew:** Berdêl, bedel
- **Gogercîn:** Kevok
- **Hêvotin:** Perwerdehî
- **Keys:** Derfet, delamet, pêkan, îmkan
- **Kolit:** Malên li guhên bajêr (gecekondu)
- **Niviz:** Niizim
- **Nola:** Mîna, wekî
- **Penah:** Stargeh
- **Ravakirin:** Nimandin, nîşandan
- **Rewa:** Meşrû
- **Rêwa:** Şîrove
- **Sarinc:** Dolaba cemedê
- **Selep:** Kanalîzasyon
- **Suxre:** Xîzmet
- **Temartin:** Naştin, cenaze veşartin
- **Wefid:** Lijne, heyet
- **Welê:** Wilo, werê, wisa
- **Xaş:** Tûr


## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

### Min Welatê Me Divê

| | Li Hundir | Li Derve |
|---|---|---|
| ☐ 3 Meh | ☐ 400.000 TL | ☐ 35 DM |
| ☐ 6 Meh | ☐ 800.000 TL | ☐ 70 DM |
| ☐ 12 Meh | ☐ 1.600.000 TL | ☐ 140 DM |

**Bedelê Abonetiyê ez radizînim**

**Li Tirkiyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Hesap No: 1100264–1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti.
Yapı–Kredi Parmakkapı Şubesi
Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507–3

**NAV Û PAŞNAV** : ..........................
**NAVNÎŞAN** : ..........................

**Navnîşana Welatê Me**
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
**Tel–Fax:** 293 53 19 – 245 29 91



**WELATÊ ME**

Rojnameya Hefteyî
**(Haftalık Gazete)**

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
**Aynur BOZKURT**

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
**Mazhar GÜNBAT**

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazışleri Müdürü)
**Metin AKSOY**

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
**Suut KILIÇ**

Redaktor
**Sami TAN**

**NAVNÎŞAN (Adres)**
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL

**TEL–FAX**
293 53 19 – 245 29 91

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÛNERÎ**
(Temsilcilikler)

**Suriye–** Jan Dost
Fener Rojbiyanî
**Berlin–** Silêman Sido
Sîrwan Reşîd
49-30-69 00 26 95
**Bonn–** Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49
**Hannover–** Selîm Biçûk
49-5721-813 60
**Hamburg–** A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
**Munchen–** Mahmut Gergerli
49-871-670 884
**Badenwurttenberg–**
A. Rahim Ayaz
49-75453258
**Swed–** Amed Tigris
46-8-740 69 81
**Amsterdam–** Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
**Paris–** M.S. Ayçiçek
33-1-48000401
**Atîna–** Ferhan Zêbarî
30-13634905


www.arsivakurd.org

## Ji konferansê çend xal


Isal sêsedsaliya nivîsîna berhema hêja ya Mem û Zînê ye. Ehmedê Xanî ew di sala 1895'an de afirandiye. Kurdan ji ber vê yekê sala 1995'an mîna sala Ehmedê Xanî îlan kirin.

Kurd bi sazî û rêxistinên xwe yên siyasî hunerî û çandî, vê sala hozanê me yê nemir, pîroz dikin. Bi çalakiyên celeb bi celeb bîr û baweriyên wî, berhemên wî û daxwazên wî tên bibîranîn, tên nirxandin û her wiha tên munaqeşekirin jî.

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê jî bi navê "Konferansa Ehmedê Xanî" çalakiyek pêk anî. Xwedîderketin û bibîranîn tiştekî xweş e û divê ev rewş bê domandin jî. Lê belê, divê ev yek bi awayekî baş û xurt bi beşdariyeke mezin û fireh çêbibe.

Pêkanîna çalakiyên wiha ne hêsan e, lê heke mirov zend û bendên xwe ji bo tiştên wiha bade, divê heta ji mirov bê, xwe bidê. Dema ku em li Konferansê binihêrin em hewleke qenc nabînin. Belê salon tije bûbû. Konferans bi kurdî çêbû, lê Ehmedê Xanî baş nehate nasandin, konferans ji aliyê naverokê ve qels ma. Kêmasiyên teknîkî li ber çavan bû. Organîzekirin jî li dera hanê.

Hêviya me ew e ku em hêjahiyen xwe yên dîrokî hîn baştir, hîn xurtir û hîn jî bimanetir bi bîr bînin. Ev bar in û li pişta me tevan e. Bi beşdariyên xurt pêkanîna çalakiyên wiha peywira me hemûyan e.



### Bi pêşengiya Enstîtuya Kurdî ya li Stenbolê ji bo Ehmedê Xanî konferanseke bi kurdî

# EHMEDÊ XANÎ LI STENBOLÊ BÛ

**Bi mebesta sala Ehmedê Xanî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê konferansek çêkir. Di konferansê de li ser berhem, raman û welatparêziya Xanî hate rawestîn. Zimanzan Feqe Huseyn Sağniç di axaftina xwe de diyar kir ku mirov nikare Mem û Zîna Ehmedê Xanî wekî berhemeke evîndarî binirxîne. Felat Dilgeş jî bal kişande ser ramanên Xanî yên li ser dewletê û gote ku ew zanîn û zorê bi hev re diparêze. Ji aliyê din ve nivîskar Faik Bulut jî di berhema Mem û Zînê de li ser ramanên materyalist sekinî.**

Bi pêşengiya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji ber sala Ehmedê Xanî roja 9'ê avrêlê bi navê "Konferansa Ehmedê Xanî" li Navenda Çandê ya Tarık Zafer Tunaya li dar ket. Zimanzan Feqî Hüseyin Sağnıç, Alîkarê Serokê Enstîtuya Kurdî Felat Dilgeş û Nivîskar Faik Bulut wekî avivkar beşdarî konferansê bûn.

Konferansê bi pevîna Zimanzan Feqî Huseyn Sağnıç dest pê kir. Sağnıç di axaftina xwe ya bi navê "Welatparêziya Ehmedê Xanî" de li ser girîngiya îlankirina sala Ehmedê Xanî sekinî û diyar kir ku lazim e hozanên kurdan ên din jî bên bibîranîn. Sağnıç der barê naveroka Mem û Zîna Xanî de jî ev got: "Hinek kes Mem û Zînê dixwazin bi tenê wekî berhemeke evînî nîşan bidin. Lê rastî ew e ku Xanî di vê berhemê de pirsgirêka kurdên wê dewrê ya neteweyî, nîşan daye." Feqe Huseyn der mafê berhemên Ehmedê Xanî û naveroka wan de jî agahî dan beşdaran.

Piştî axaftina Sağnıç, Alîkarê Serokê Enstîtuya Kurdî Felat Dilgeş peyivî. Dilgeş di axaftina xwe ya bi navê "Ehmedê Xanî û Dewleta Neteweyî" de fikrên zanayên mîna Platon, Makyawelî, Îbnî Haldûn, Thomas Moor û Thomas Habs ên der heqê dewletê de bi yên Ehmedê Xanî re muqayese kirin. Nêrînên wan kesan û yên Ehmedê Xanî nirxandin û gote ku Xanî zor û zanînê di gel hev diparêze. Dilgeş, daxuyand ku heta fikrên wan fîlozofan ên der barê wesfên dewletê de neyê zanîn, Ehmedê Xanî jî bi awayekî baş nayê fêmkirin. Felat Dilgeş di axaftina xwe de da zanîn ku Xanî ji bo yekîtiya kurdan avabûna dewletê ferz dîtiye û lewre wiha gotiye:

**Herçî bire şûrî**
**destê hîmmet**
**Zebt kir ji xwe re**
**bi mêrî dewlet**
**Bêceng û cîdal û**
**bêtehewwir**
**Qet vê şixulê**
**mekin tesewwir.**

Ji hêla din ve Dilgeş gote ku Xanî xwestiye mirovên zana gel îdare bikin.

Konferans, bi axaftina nivîskar Faik Bulut hate qedandin. Mijara Faik Bulut jî "Di destana Mem û Zînê de Materyalîzm" bû. Bulut, dêhna beşdaran kişande ser fikrên materyalîst û diyalektîk ên di berhema Mem û Zînê de. Faik Bulut diyar kir ku, bi tenê hêla Xanî ya welatparêzî hatiye dîtin. Lê divêt hêla wî ya felsefî jî bê dîtin û fêmkirin û bi hev re bên nirxandin. Bulut, ji helbestên Ehmedê Xanî nimûne pêşkêş kirin û felsefeya wî da naskirin.

Mebûsê Serbixwe yê Erziromê Melik Fırat û Berpisyarê Giştî yê Nûbarê Sabah Kara ji ber nexweşînên xwe beşdarî konferansê nebûn. Li gorî bernameya konferansê wê Melik Fırat li ser "Jiyan, Oldarî û Edebiyata Xanî" û Sabah Kara jî wê li ser "Teknîka Helbesta Ehmedê Xanî" bisekiniyana.

Konferans ji bilî axaftina Faik Bulut, bi kurmancî hate çêkirin.Di gel beşdariyeke mezin, mirovên naskirî jî hatibûn konferansê. Di nava mêvanan de Aziz Nesin, Hasan Basri Aydin, Firat Cewerî, Ali Beyköylü, Edibe Şahin, Ganî Nar û kesên ji îdareyên teşkîlatên HADEP'a bajêr û navçeyan hebûn.

**ZANA FARQÎNÎ**

*elinewêrek*

